

*Meşa  
azadiyê di  
15 saliya  
xwe de*

Rûpel 16



Sal:1 Hejmar:41 29 Mijdar-5 Kanûn 1992 5000TL (KDVD) Rojnameya Hefteyî

## Salvegera PKK'ê bi meclîsê xemilî

14 sal berê, şitlên serxwebûn û azadiya gelê Kurd, ji aliyê Partiya Karkerên Kurdistan ve pêşî li bakurê Kurdistanê hatin çandin, dû re şitil zêde bûn û li çar aliyê Kurdistanê hatin çandin. Di 14 salan de civaka Kurd qalikê xwe guhert, ew gelê ku ji hev ketibû û bûbû biyaniyê xwe, bi carekê xwe nû kir û dil berda serxwebûn û azadiyê. Bi pêşengiya Partiya Karkerên Kurdistan ev têkoşîn her diçe bi hêz û xurt dibe. Di 14 salan de lehenîgiya gerîlayên ARGK'ê û xebatên ERNK'ê bûn dînamîzma vegahehîna civaka Kurd.



Di bîranînê  
Çağlayangil de  
Seyîd Riza

Rûpel 12



14 sal piştî salvegera damezirandina Partiya Karkerên Kurdistan gelê Kurd ê ku xwe ji rihê koletiyê xelas kiriye û ji bo serxwebûnê ketiye rê, gaveke pirr girîng di meha Mijdarê de avêt. Ev gava girîng di warê damezirandina Meclîsa Kurd a Neteweyî de bû. Roja 20, 21 û 22'ê Mijdarê, gelê Kurd ji bo hilbijartina delegeyên Meclîsa Kurd a Neteweyî çû ser sindoqan. Li Ewropa, bi besdariya nêziki 90 hezar Kurd, 153 delegeyên Kurd hatin hilbijartin. Ji 153 delegeyan, wê 15 nûnerên meclîsê bêñ hilbijartin.

Rûpel 8



Brecht û  
tiyatroya  
epîk

Rûpel 13

## REWS



Abdullah Keskin

## Weşanêñ Kurdî

**N**izanim bala we kişandiye an na? Ev du hejmar e em di Welat de li ser rewşa weşanêñ Kurdî disekinin.

Heta niha ev salek du sal e çend kitêb bi Kurdî hatine çapkîrin? Tîraja wan çiqas e? Çiqas ji wan têñ firotin? Weşanxane ci difikirin? Ji vir û pê ve wê kîjan weşanxane giraniyê bidin ser kitêbêñ Kurdî? Kî, ji bo ci kitêbêñ Kurdî diweşîne? Me bersiva van pirsan me-raq dikir.

Nûçevanêñ Welat ev pirs ji weşanxaneyêñ ku heta niha li ser Kurdan kitêb derxistin e, kir. Li dor 50 weşanxane li ser pirsgirêñ Kurdan nêzîki 500 kitêbî çapkîrin e. 15-16 weşanxaneyâñ jî, li dor 40 kitêbêñ bi Kurdî çapkîrin e. Gelek ji wan "edebî" ne. Li ser zimêñ hinek hene, wekî din lêkolîn geleki kêm in, heta nîn in. Li gor van reqeman ji her weşanxaneyekê re 2-3 kitêb dikevin. Tîraja van kitêban ji hezarî heta bi sê hezaran diguhere. Ji her kitêbê, li dora sêsed hezar hebî têñ firotin. Weşanxaneyêñ ku zêde kitêbêñ bi Kurdî çapkîrine di xesarê de ne. Ji ber vê ji gelek weşanxaneyan ji programen xwe weşanêñ bi Kurdî derxistine.

Hinek weşanxane ji hene ku fîkrê wan geleki xerîb e. Ji sedî not weşanêñ wan li ser Kurdan e. Herkes wan nas dike, ne hewce ye em navêñ wan binvisin. Gelek caran em ji wan dipirsin: "Hûnê kengî kitêbêñ Kurdî derxin?" Be-

rî ku piyasa kitêbêñ bi Kurdî belî bibe, ji bo telîfê van weşanxaneyan bi nivîs-kerên Kurd re têkîlî datanîn. Pişt re piyase belî bû, kitêbêñ bi Kurdî zêde ne-hatin firotin, wî çaxî sebebek ji xwe re çekirin: Em kitêbêñ bi Kurdî naweşînin, divê Kurd bi xwe vî karî bikin.

De were vî kerî di vî kurtanî re derbas bike! We heta niha ci kar ji Kurdan re hiştîye ku hûn vî karî dihêlin? Li dijî vê sebeba wan ev gotina pêşîyan tê bîra mirov. Ger ev kar hinekî bi pere bûya tu caran ne digotin, hûn vî karî bikin. Lî biweşîne neweşîne, were firotin neyê firotin ev kar karê me ye, karê me Kurdan e. Ji bo me wezifeyeke netewe-

**Heta niha weşanxaneyan ci derxistin ku xwendevan li wan xwedî dernekeçin? Gelo kitêbeke ku tiştekî bide mirov derkecie heta niha? Ger hûn li programa weşanxaneyan binêrin tiştekî zêde balkêş nabînin. Çend xebatêñ ilmî, edebî çap bûne; ji bo bersivê hê zû ye.**

yî ye.

Li gor lêkolîna hevalêñ me, vê dema pêşîya me incax 5-6 weşanxane bi Kurdî kitêban amade dîkin. Ew jî Doz, Melsa, Komal, Koral... e. Pirsgirêk mezin e. Zimanekî ku ev 70 sal in qedexekirî ye serbest dibe û tu kes lê xwedî dernakeve. Ger aliyekeki pirsgirêkê xwendevan bin, aliye din jî ev kitêbêñ ku bi Kurdî çap dibin e. Yanê xebata weşanxaneyêñ Kurd e.

Heta niha weşanxaneyan ci derxistin ku xwendevan li wan xwedî dernekeçin? Gelo kitêbeke ku tiştekî bide mirov

derkecie heta niha? Ger hûn li programma weşanxaneyan binêrin tiştekî zêde balkêş nabînin. Çend xebatêñ ilmî, edebî çap bûne? Ji bo bersivê hê zû ye.

Berî her tişti û herkesî divê em bi xwe kêmâsi û xeletiyêñ xwe bibînin. Divê em ji rexneyan netîrsin. Însanêñ weşanxane teqîb dîkin dizanîn. Ji xeynî 2-3 kitêban, kitêbeke ku hêja be, mirov bikire û bêxe kitêbxaneya xwe nîn e. Wextê mirov li qapaxê kitêbêñ bi Kurmançî dinêre tu dibê qey berî wan li dînyayê, li tu deveran kitêb dernekeçine, ewqasî ecemî ne. Kitêbeke ku di qadekê de mirov hîn bike nîn e. Kitêbêñ çapbûyi bi giştî kevn in, mirov dikare çiqasî li wergerandina wan emînbibe? Bêhtir şîr û hikaye derketin, gelek ji wan jî gelêri ne, berhevkirine û bi navê xwe çapkîrine. Li gorî dîtinêñ xwe yê subjektif guhertin e.

Ziman jî astengekî giřing e. Zimanekî standart, ji aliye rîziman û rastnivîsê ve rûniştî nîn e. Her weşanxane bi serê xwe ye. Li gorî kîfa xwe zimêñ diguhere, alfabeyle xera dike, vî heqî bi xwe re dibîne. Hûn dinêrin li ser du kitêban ey-nî amblem heye, her du jî yê weşanxaneyekê ne. Lî her yekê bi zimanekî hatine nîvîsandin, alfabebla wan ji hevdû cihê ye. Weşanxane wilo bin, xwendevan wê çawa bin?

Rewşa xwendevanêñ Kurd li ber çava ye. Xwendevan ji zimanê xwe direvin. Ji aliye din qedexetiya li ser zimêñ hê jî dom dike. Çiqas naveroka wan ne siyasi jî be polis kitêbêñ Kurdî ji mala kom dîkin.

Li Tirkîye li dora 500 weşanxane he-ne. Tev de bi Tirkî kitêban diweşînin. Li dora 20 weşanxaneyêñ Kurdan hene ew jî giraniyê didin Tirkî. Hê jî weşanxaneyekê ku tev weşanêñ wê bi Kurdi ne tune ye.

Bi vî awayî emê çawa ziman û çanda xwe bi pêşve bibin?

## FERHENGOEK

- Ajave: Qerebalix (kalabalık)
- Ba: Romatîzma
- Bawî: Bi romatîzma
- Bêtêl: (telsiz)
- Cerde: Operasyon (baskın)
- Dijraber: (direniçi)
- Dijraberî: Berxwedan (direniş)
- Dîw: Gend (pazı)
- Dorhêl: Derdor (etraf, çevre)
- Encür: Qitik, qitî, bejik
- Galegal: Sohbet, guftugo
- Gerew: Rehîn, barimte
- Gumanbar: (şüphecî)
- Girav: (ada) erdê ku ji çar alî ve bi avê hatiye girtin
- Kedkar: Proleter, xebatkar
- Kelek: Keşti (gemi)
- Kêlî: Deqiqe
- Kerşît: Li başûrê Kurdistanê navê xwarinekê
- Kudandin: Ajotin, meşandin, domandin
- Kurte: (özet)
- Libo libo: Yeko yeko (teker teker)
- Lazût: Gilgil, garis
- Lê: (geçerli)
- Lûs: Meqam, cih
- Narinçok: Bômba destan (el bombası)
- Nelê: (geçersiz)
- Nerasterê: İndirekt, binavgîn (dolaylı)
- Pûng: Cureyek giyayê ku bêhn xwe û tê xwarin (yarpuz)
- Raste rast: Bênavgîn, direkt (doğrudan doğruya)
- Riwês: Rimbêz, rimêz
- Silk: Silq (şeker pancarı)
- Şikoke: Şekok, karçın, karışık
- Şom: Bêoxır
- Şkeva: (yufka)
- Nanê şkeva: (yufka ekmek)
- Tawî: (sitmâl)
- Tiral: Tembel, bê xiret, cangiran
- Tirali: Tembelî, cangiranî
- Xes: Marol
- Zekem: Nezle, griп

## Nameyek ji hesreta dilan

Jîr Dilovan

Hevalê Dîcle

Zarokên min ji kerbê te û hevalêñ din har û dîn bûne. Pirr bêriya wî kirine. Em her roj û her şev bi we re ne. Sibehê em radibin û xewnêñ xwe ji hev û din re dibêjin.

Vê sibehê pîreka min rabû û deng li min kir, got "Rabe Jîr, min didît, Dîcle, Medya û Yekbûn ji kaniyê av dikişandin. Min ji Dîcle re digot: "Ew ava ku min ji we re şiyandibû nema?" Li min nerî û beşîşî. Dû re min didît Dîcle di nav gul û çiçekan de bû. Kirasekî sor û dirêj lê bû. Bi min re dikeniya."

Pîreka min ew xewn got û hêstir barandin. Dest bi girî kir. Got: "Dîsa ketine şer. Tengasi li wan çêbûye."

Ez di ber dilê wê re cûm

min got: "Xêr e.. Tiştek nabe. Ji ber ku tu, tim li wan dihizirî, hatine xewna te."

Lê ew serpêhatiya xwe ku te ji min re gotibû hate bîra min. Ji ber vê yekê ez niha geleki bi kul û meraq im. Te wiha gotibû: "Em çar heval bi dijmin re ketin şer. Germa havînê bû. Dijmin bi carekî çarmedorê me girt. Ji sibehê ta êvarê me şerê xwe kir. Ji bîna bârudê, ji duxanê, toz û tirabê û ji tava dijwar dev û pozën me ziwa bûn. Ava me nema. Di xwêdanê de em bûne wek dîkê şemitanî. Hin bi hin fişekê me ji kêm kirin. Dema şeva reşî bi ser me de hat, bi desthilanîneke mezin me rista leşkeran qut kir û em wê carê ji bi serkevtin bûn."

Ev serpêhatî tim li bîra min e. Gelo hûn niha li kuderê ne? Gelo hûn têr in an birçî ne? Gelo hûn bi av in an tî ne? Gelo hûn bê xew in? Hûn li ku erdê û ku ciyayı ne? Xwezika bi wê demê ku, hûn carna dihatin me hev û din didit. Em hemû bu we şa dibûn. Niha em hemû bi hesreta wê pevy û rewşa delalî ne. Bi vî dilê xemgîn û bi vê hesreta giran, ez banga xwe digihînim we: "Dîcle, Medya û Yekbûn.. Hûn li kuderê bin, hûn sax bin, bîrindar bin an jî şehîd bin, bi her awahî hûn, di dîl û cegerê me de dijîn û hûnê her bijîn..

Silavêñ bi hesreta giran, layî Cudî, layî Sipan û layî hesreta Kurdistan ji we û hevalêñ we re...

## Pêşmerge yan jî gerîla

Rojnameya Welat iro li bakurê Kurdistanê du armançen herî mezin û giřing xistine pêşîya xwe. Weki dengê şoreşa Kurdistanê hatiye meydânê û hejmar bi hejmar deng û bahsîn şoreş, Kurdistanê, pêşveçûn û pîroziyên şoreş, zilm û zordariya dijminan û çewtî, rastî ya dinav gelê Kurd de belav dike.

A diduyan vejandina peyva Kurdî ye, bi rastî (Welat) di vî waři de karekî pirr hêja yê pêşvebirî pêk tîne. Roj bi roj Welat tê xemilandin bi pevy û gotinê petî û resenêñ Kurdî û tiştên winda eşkere dike û tiştên bê hêz bi hêz dike. Belê ev pirsa bo mirovî dête pêş çima peyva gerîla ji bo şervanêñ Kurdistanê bi kar tînin? Pêşmerge ne



Bûyerên hefteyî

## PKK'ê 4 leşker azad kîrin

PKK di salvegera damezrandina xwe de, 4 leşkeren Tirk ku di êrişan de dîl girtibû azad kîrin.

Li gor beyanên leşkeran, ji dema dîlgirtinê, ta roja azadkirinê, tu tevgerek ne baş ji alî gerila ve, li hember wan nehatiye kîrin.

PKK çend roj berê, bi daxuyaniyekê, bîryara azadkirina leşkeran diyarı raya giştî kîribû. Ev çar leşkeren dîl, li gor beyana PKK'ê li Cizirê hatin azadkirin.

Leşkeren azadkirî, der heqê PKK'ê de bi kurtî dîtinê xwe wiha anîn ziman: "Heta ku me PKK nas nedikir, me ew wek râexistineke terorist dizanibû, lê piştî ku me ew nas kîr, niha em baş dibînin ku PKK ne terorist e. Dewleta Tirk bi agahdariyê çewt û ne rast PKK'ê bi gelê Tirk dide nas kîrin. Gerîlayen PKK'ê pîrr mirovhez in, ên ku carekê wan dibîne êdi nikare wan ji bîr bike. Em wan wek dostê xwe dibînin.

19.11.1992 -Li Ruhayê li nêzîkî navçeya Siwerekê, gerîlayan êrişî ser depoya leşkeri ya NATO'ye kîrin. Di nav hêzên dewletê û gerîlayan de şer derket; panzereke leşkeran imha bû, 6 leşker hatin kuştin û depoya NATO' ye ji zerar dît.

Li Batmanê li nêzîkî navçeya Hezo, gerîlayan bîra qîrê ya bi navê xwe Şelmo 1'ê şewitandin, dû re ji bi leşkeren ku dihatin ser wan ve ketin şer, panzereke wan imha kîrin, gelek leşker ji kuştin.

20.11.1992 -Li Batmanê li navçeya Sasonê gerîlayan riya gundê Aydînlîk birrîn. Ji erebekê 21 kes derxistin, dû re ji van 21 kesan 11 heba ber dan, 9 hebê ku xayin derketin bi xwe re birin.

Li Ixdîrê di nav hêzên dewletê û gerîlayan de şer derket, 2 leşker hatin kuştin, 7 ji birîn-

## Avahiya Ünal Erkan hate bombekirin

Gerîlayen PKK'ê, di roja 24 ê Mijdarê 1992 an de, bi ser avahiya Waliyê Herêma Rêveberiya Taybetî ve girtin û bi bombe û gullebaranê avahiye kutan. Avahiya wali, li Diyarbekir, taxa Şehîtlîkê ye û ev cara yekemîn e ku êrişêk wiha bi ser vê avahiye ve diçe. Gerîlayen ku êriş pêk anîn, dû re, bi serfirazî ji hêla bûyerê hilkişyan û nehatin girtin.

Hêzên dewletê, piştî vê êrişê dest bi girtina gel kîrin. Heta niha bi dehan kes hatine gîrîn û binçavkîrin.

dar bûn. Li Çepekkûrê (Bingolê) li navçeya Adakli li nêzîkî herêma Sîvan, dî nav hêzên dewlet û gerîlayan de şer derket 2 leşker hatin kuştin.

21.11.1992 -Li Diyarbekir li navçeya Licê, gerîlayan êrişî ser qereqola gundê Kayacik kîrin. Gelek xesar dane qereqolê. Piştî êrişî gerîlayan leşkeren qereqolê ji êriş birin ser gund û xaniyênd gund gulebaran kîrin. Dîsa li navçeya Licê, gerîlayan avêtin ser gundê Taşeli, erebeyekê TEK'ê şewitandin. Li Pirînê (Adiyaman) li nêzîkî gundê Yazîbaşî, di nav hêzên dewletê û gerîlayan de şer derket, 3 leşker hatin kuştin û helikoptereke leşkeran ji xesar dît.

22.11.1992 -Li Çepekkûrê (Bingolê) gerîlayan avêtin ser navçeya Karlıova yê, avahiyênd dewletê dan ber gule û roketan. Gelek xesar dane avahiyênd dewletê, polisekî ji birîndar kîrin. Li navçeya Midyadê li gundê Budaklı, gerîlayan xayinekî kuştin û wî bi darekê ve daleqandin. Li navçeya Siwerekê milisén welat-parêz bombe avêtin 3 banqeyan, her 3 banqe ji xesar dîtin. Li Diyarbekir li gundê Büyükkâveren, ji bo gerîlayekî ku şêhid ketibû merasimek ji alî gundiyan ve hat çêkirin.

24.11.1992 -Li Sîrtê, gerîlayan êrişî ser navçeya Şîrwanê kîrin, gerîla bi 2 rîza ketin navçeyê. Avahiyênd dewletê û avahîya emniyetê dan ber gule û roketavêjan. Di nav wan û hêzên dewletê de şer derket, kuşti û birîndar çenebûn, avahîya emniyetê gelek xesar dît. Li alî din li Nisêbînê, hêzên dewletê avêtin ser taxên, Yeni Turan, Kışla û A. Kadir Paşayê, 200 kes xistin bin çav.

PKK ji bo salvegera 15 saliya sazûmana xwe, li hînek bajar û navçeyan belavok belav kîrin.

## Cînayet an qetlîam

Hîzb-i kontra cînayetên xwe didomîne. Niha ji berê xwe daye mirovîn demokrat û bêali. Li navçeya Diyarbekir Farqînê, ku dewlet ev navê ji xwe re wek navenda cînayetan bijartîye, 2 kesen din ji hatin kuştin. Yek ji kuştiyan, bi navê xwe Mehdî Şanlı, li Lîseya Farqînê mamosetiya xwe didomand. Fîrat Geçmez ji, ji bilî mirovatiya wî ya bi Mehdî Şanlı re, ne ji bo tiştekî din hate kuştin. Weke ku xuya dibe, iro her kesê ku li Kurdistanê dijî berendamê kuştin ye. Divê gel bi vê zanebûnê li hember van cînayetan rawsete û xwe teví hemwelatiyê xwe biparêze.

## HAWAR

### Dilbixwîn

#### Em cûn ser sandiqêñ xwe!

E m raneketin, xew nehate ser çavêñ me. Şevêñ zivistanê dirêj in, çavêñ me li hatina rojê û derketina tîrêjan westiyan. Em li bennda hilatina roja 20'ê Mijdarê bûn. Ew roj bi me bû roja eydê (cejnê).

Tîrêjan xwe ji nava tariya ezmanan avêtine der. Lingêñ me erdê nagirin, gelo wê kengê saet were ser 9'an? Sindoq di saet 9'ê 20'ê Mijdarê de vedibûn. Li ser serê her sindoqekê bi sedan hemwelatiyê Kurd kom bûbûn. Weke ku em bûkekê rî bikin, dîlanê bîgerînin, wisa govend li hev digeriya. Bi zilxit û tililiyan, bi def û zirneyan, bi gul û gupikan, bi desmalen kesk û sor û zer, bi "Ey Reqîb" û "Herne Pêşan" em cûn ser sindoqêñ xwe!

Dilê me gulan dîbarîne. Çavê me hêstiran diherikîne, li ser demêñ me pêlêñ hêstiran bilind-bilind dibin.

Kenekî şîrîn xwe davêje ser devê me, ji şabûnan re lîvîn me nayêne ser hev.

Di dilê xwe de dipirsim: "Gelo, di vê kîliyê de Kurdistan çi difiki-re?!"

Belê; em diçîne ser sindoqêñ xwe. Ne xewn e, ne ji xeyal e. Eger sal 1972 bûya, dibe ku hînekan bigota: "Kurd bi ser xwe ve cûne, lê hema sal

1992 ye. Xewn û xeyal bûne rastî. Di 70' yan de Kurd ne Kurd bûn. Kurdistanê Tîrkiyê, Sûriyê, Îranê û Iraqê hebû. Kurdêñ Tîrkiyê, Sûriyê, Îranê û Iraqê hebû. Kesekî nikaribû bigota Kurd ên Kurdistanê. Lê hema iro; Kurdêñ Kurdistanê û Kurdistanê Kurdan heye. Ev in, dinya; eger kor nebûbe, dibîne Kurd bi ci serbilindiyê diçine ser sandiqêñ serxwebûn û azadiyê.

Ev car ne weke her carê ye. Vê carê Kurd tiştekî din dibînin. Rengê pusuleyan, engê alay li ser sindoqan, kesen li ser sindoqan ne Tirk, Ereb û Faris in. Ew kes Kurd in. Ala bi sînga sindoqan ve hat daleqandin ala ERNK'ê ye. Kesek naxwaze ji ser sindoqan biçe, wê radimûsin û dibêjin: "Pîroz be! Aqûbet li serxwebûn û azadiya Kurdistanê be."

Heya çav bi xwe nebînin mirov bawer nake, gelo wê ev nîvisok (qelem) çawa dîrokekê di vê koşeya tengbîne ziman?! Ax...! Xwezi ez bazekî azad bûma û li ser hemû sindoqan bigeriyyama. Min ê destê hemwelatiyân biguvaşa, bihejanda û bigota: "Heke insanekî tenê di dînyayê de mabe ji, bila destê xwe bide ser ûjdana xwe û bibîne, Kurd bi qefleyan diçine ser sindoqêñ hilbijartina avakirina Meclîsa Neteweyî ya Kurdistanî (MNK)." Em destûrê ji tu kesekî nastînin, kesek qebûl neke ji, em qebûl dikin, em destûrê din. Em dibêjin erê, em dibêjin na.

Haydê werin! Em destan bidin hev, milan bidin hev û gulên sor ji bo Cumhûriyeta Kurdistanê ya gelî pêşkêş bikin.

# Mafen mirovan û dewleten Ewrupa

## Yekda Welat

Komên mafen mirovan û komisyonen dewleten Ewrupa, ji bo mafen mirovan li ser Amerika Latinî, Afrika-Basur, Kurdistan û hwd. xwedî dernakevin. Her xebat ji bo mafen mirovan, girêdayî pêwendîya dewleten Ewrupa û bîrdoziya wan e. Ku dewleteke imperialist wek Tirkîye bi xwe imperialist be, dewleten Ewrupa

navê wan rejîman bi demokrasi û xwedî mafen mirovan li welateki deng bikin, divê destûre ji dewleten xwe bixwazin. Ev komisyonen mafen mirovan, li şuna ku li mafen mirovan xwedî derkevin li diji tevgera serxwebûn û azadiya welaten bindest derkevin. Dema şoreşa Kuba û Nikaragua bi ser ket, li Ewrupa, rêtixitên bi navê xwe komeleyen mafen mirovan digotin ku, "Kuba an ji


Nikaragua diktator in û vê terorê dimeşinin." Wan komeleyan li ser hovîtiya Somoza deng nedikirin.

Niviskareki Amerika Latinî Gabriel Garica Marquez, di axafina xwe de ji bo standina xelata Nobel wiha dipirse: "Çima hûn (welaten rojava) maf didin me ku di pirtükên xwe de li ser şoreşê binivisiñin, lê di karvaniyê (pratikê) de ji bona guhertina civaka xwe hûn li diji me derkevin?" Garica Marquez wiha dom dike: "Çima welaten Ewrupa dixwazin civaka xwe ji bo başiyê pêşve bibin û biguherin, lê li Amerika Latinî wî maf nadin me û naxwazin ku em bi metodên xwe li gora hebûna gelê xwe, civaka xwe biguherin?"

Ji aliyeke, welaten Ewrupa xwe pirr pêşketi, pêşverû û demokrat dibinin, lê napecjirin ku welaten bindest, li gora idare û qudrafa xwe, li gora hoyen jiyana xwe, edebiyat û civaka xwe, welatê xwe rizgar bikin û wek gelên dinê aza bin.

Diroka dewleten Ewrupa diyar dike ku, beriya mafen mirovan û demokrasiyê, pêşî kedxwari û interesen wan xwestinên wan, pêwist in. Li Hindê, Afrika, Amerika û Rojhilat, bi milyorian mirov ji bo kedxwariyê û talankirin kuştine.

Li ser rewşa mafen mirovan li



Dewleten imperialist û komên wan ên mafen mirovan dixwazin ku ev rewşa hovîti wiha bimine. Qet naxwazin ev statu bê guhertin.

Amerika Latinî sekerterê Ronald Reagen, Elliot Abrams, wiha dibêje: "Em divê ne tenê li ser mafen mirovan rawestin, divê em bizanibin bîrdoziya wan ci ye?" Abramsango dixwaze bibêje ku têkoşinek an ji welateki sosyalist be, mirov dikare li vê derê wek li Vietnamê, bi hovîti qirkiranin bimeşine. Abrams dixwaze li ser navê imperialistên mezin Reagan û Bush bibêje ku welatek an komek ne imperialist be, divê mafen mirovan ji hebe.

Wiha eşkere dibe: "Mafen mirovan li Kurdistanê hebe an ji tune be interese nake. Tenê pêwist e ku Ewrupa û imperializm dikarîbê kedxwariya xwe bîdomîn.

Li ser navê mafen mirovan hinek mebûşen Alman wek Sigfried Martsch, ji Partiya Keskan, Die Grünen, bi veşartî ji imperializmê re kar dikan. Li Ewrupa Sigfried Martsch, bangeşî ji bo komên paşverû û hevalbendê imperializmê KDP û YNK ê re dike. Navê Martsch hatiye guhartin û her kes jê re dibêje Sigi Berzanî. Martsch xwe wek mirovki şoreşger, mirovpârê û çep diyar dike. Li veşartî pêwendiyen Kontra-Kurdî (Cepha Kurdistani) bi dewleten imperializmê re xurt dike. Di her cîvînên xwe de Martsch, bi zanebûn dixwaze tevgera serxwebûn û azadiyê, PKK bi navekî ne baş diyar bike. Pirr kom û mirov wek xala jorîn li Ewrupa hene û li diji doza serxwebûn û azadiyê kar dikan.

Amnesty International (AI) di 11.11.1992 an de li bajarê Londonê, di rapora xwe de diyar kirku dewleta Tirkîye bi her babeti li diji mafen mirovan derkeve. Dewleta Tirkîye mirovne tewandar, sivil dikuje û her roj hingavtinan çedike. Lê bili wê bûyer û agahiyê dîsa, ji dewleta Alman dixwaze bi 1.5 Milyar mark alîkîriya leşkeriya Tirkîye bike. Komisyonen mafen mirovan li Almanya bîdeng diminin û her wiha qirkirina gelê Kurd dixwazin.

Dewleten Ewrupa bangeşîya "demokrasiya Tirkîye" dikan û çavên xwe digirin ku bi tanq û çekîn Ewrupa gelê Kurd li Cizirê, Şîrnejê, Kulpê, basûrê Kurdistanê û hwd. tê qirkirin.

Parastina mafen mirovan li Kurdistanê, ne wiha hêsan e. Piştgiri û alikari ji bo gelê Kurd, pirr girîng e. Lê Kurd edî hevaltiyek rûvitî û kér li piştixtinê napecjirine û her mirov ji nabe destê gelê Kurd. Gelê Kurd û têkoşîna rizgariya neteweyî, rêtixitên mafen mirovan û yên dinê, ji wan gotinan bawer nakin, fermo werin Kurdistanê, çavên xwe vekin-û rastiyê bibînin.

Du dostê Kurd hene: Yek gelê Kurd bi xwe ye û dido çiyayen Kurdistanê ne.

## Neonaziyên Almana û nîjadperesten Tirk

Li Almanya, hêzên nîjadperest, tevgeren xwe yên li diji biyaniyan roj bi roj zêdetir dikan. Biyaniyen ku ji bo xebatê an ji, ji ber sedemîn politik li Almanya niştecih bûne, dibin hedefen neonaziyan û ji çend rojan carek yek ji wan an birîndar dibe an ji tê kuştin.

Ev bûyera dawî ji, hovîtiya neonaziyan eşkere û berbiçav dike. Li nêzîkî bajarê Hamburgê biyaniyên ku li navça Mollnê niştecih bûne, ji alî neonaziyan ve xaniyên wan hatin şewitandin û di vi êrîşê de, 3 kes mirin, nêzîk 9 kes ji birîndar bûn.

Ev êrîş, li dînyayê bû se demî protestoyen girseyî û neonazi hatin lanetkirin.

Piştî vê bûyere, rêvebirên dewletê û rojnameyên Tirk, beyanen durû weşandin. Man-

şetîni rojnameyan çend roj li dû hev, bi vê bûyere dagirî bûn û hikümeta Alman dihate protestokirin. Lê dema ku Kurd li gund, navçe û bajarên xwe têne kuştin, malen wan têne şewitandin û talankirin, Kurdên ku ji ber zîlma dewletê reviyane metropolên Tirk û li wan deran bi cih bûne, bi êrîşen nîjadperest têne kuştin û malen wan têne şewitandin, deng ji tu yekî dernakeve yan ji van kirinê faşist destek dikan. Di nav êrîşen neonaziyan û nîjadperesten Tirk de, tu ferq nîn e. Dikarê bêje ji ber ku li Tirkîye nîjadperestî bi destê dewletê tê meşandîn û ji yên nenoziyên Almanya, dîjwartir û gemarîtir e. Dema li Almanya êrîşke neonaziyan pêktê, pêşî ji alî hikümetê ve tê protestokirin. Lê li Tirkîye?

gavek bi paş ve naçe û bi tu awayî tawîz nade, roj bi roj berfireh dibe û li Kurdistanê gelek tê xwendin, tu kes ew rojnameyên bênamûs nastîne; rûniştin, dek û dolaban li dû me gerandin.

Wilo bîryar dabûn ku, vê rojnameyê li Kurdistanê nedine xwendin û nehêlin belav bibe. Li Batmanê, li Diyarbekirê, li Mêrdinê, li Qulpê, li Cizirê, bayiyên rojnameyan tirsandin, gulle reşandin, ew qamyonen ku rojname belav dikan, agir berdane wan, şewitandin. Armanca wan kifş e, naxwazin "Gündem" bike ve nav sînorên Kurdistanê.

**Wilo bîryar dabûn ku, vê rojnameyê li Kurdistanê nedine xwendin û nehêlin belav bibe. Li Batmanê, li Diyarbekirê, li Mêrdinê, li Qulpê, li Cizirê, bayiyên rojnameyan tirsandin, gulle reşandin, ew qamyonen ku rojname belav dikan, agir berdane wan, şewitandin. Armanca wan kifş e, naxwazin "Gündem" bike ve nav sînorên Kurdistanê.**

keve nav sînorên Kurdistanê.

Ji bo vê meseleyê, ez û du hevalan, em pênc-şes roj berê cûn Enquerê cem Wezîrê Karêñ Hundîrîn İsmet Sezgin û Wezîrê Dewletê Akîn Gönen. Ez û hevalan, me kurt ji wan re got: "Ev çilo

demokrasi ye? Rojname çapkirin, belavkirin û xwendin heqê me ye. Hûn dewlet in, ev tiş di destê we de ye. Li welatek, qanûn û nîzam an heye, an ji tune ye."

Ji Osmaniyan heta niha, bi zordesiyê Kurd û Kurdistanê idare kirine, lê edî nabe. Kurdan, zordesiyâ "İttihat û Terakki" ji, zordesiyâ û koledariya CHP'ê ji şikandine. Niha ji, Süleyman Demirel û Erdal İnönü dixwazin bi xwinê, bi kuştinê Kurdan qir bikin û biqedîn. Lê, Kurd bi kuştinê naqedin. Divê ew tiştekî din bifikirin. Ew ji biratiya Kurd û Tîrkan e. Ger mafen Tîrkan û Kurdan bibine yek, birati hê dibe birati. Wekî din xapandin e. Edî Kurd hez nakin bêne xapandin. Dinya, ne dinya berê ye. Kurd ji, ne Kurdên berê ne, lewre edî Kurdistan, ne Kurdistana berê ye.

Li ser birati û hevaltiyê, di van rojan de gelek kes axaftinan dikan. Ev çawa birati ye ku qenaleke televîzyonê ji, ji me re zehf dibinin, ev çilo birati ye ku em tenê dema kuştinê dikevin bîra wan?

"Gündem", derd û kulên Kurdan dinivise. Ji ber vê yekê, neyaren Kurdan, xebatkarên "Gündem"ê, di bin agir de dixebeitînin, xebatkarên "Gündem"ê, hedefen nişana tivingan in. Lê, kes ji me, ji mirinê natirse. Kuştin, tu tiş safi na-ke. Ev ne rê û rîc e, ev ne birati ye, ev neyartiyek mezin e. Lê daxwaza me birati ye, "Gündem" biratiyê dixwaze. Herbijî "Gündem".

## GOTİN



Yaşar Kaya

## Wê 'Gündem' bijî

Seydayê Cegerxwîn dibêje: "Welatê me, navenda cengê ye". Rojnameya me ji, bi nav û deng e. Nav û dengê wê, neyaran ji bîhist, hevalan ji. Di diroka me de, di van 150 salên dawî de, rojnameyeke wiha derneketiye. Ji ber vê ji, "Gündem" malê gelê me ye. "Gündem", zaroja gelê Kurd e. "Gündem" çawa derket, astengî û zorahiyen li pêsiya derketina "Gündem"ê ci bûn, ger bê nîvîsandin, wê bibe romanekê dirêj. Piştî derketinê ji "Gündem", ji gelek ba û bageran bi serfirazî derket û nexeniqî. Roj bi roj, di nav gelê Kurd de, xwe da naskirin, gelê Kurd ji, wek zarokeke xwe lê xwedî derket.

Lê belê, ev xwinxwar û kolonyalist, dîtin ku "Gündem", li Kurdistanê ci bibe, weke rastiya wî dinivise û nûçeyîn rast dide. Ji ber vê ji "Gündem", li ber çavên wan bû weke striyeke mezin. Bi top û tivingan, gelek gulle berî "Gündem"ê dan. 4 heval û mamosteyen me şehîd kirin. Kekê Musa Anter ji, yek ji wan şehîdan bû. Bala xwe danê ku kes

## CMUK'a du alî

**Navenda Nûçeyan-** Di 18'ê Mijdarê de Qanûnê Usûlî yê Muhakemeyên Cezayî (CMUK) ku tu ferq di navbera wî ú yê İ-talyaya faşist ya 1914 an de tune ye, bi hin guherinê şıklî ji alî. Meclîsa Tirkîyê ve hat qebûlkirin. Hin ji van guherinan ev in: Demâ bin çav mayînê de ji bo súcen yekane 24 saet, súcen girseyî 4 roj, dadger dikare vê demê 2 qat dike. Ji bo súcen ku dikevin nav sînorên Dadgehîn Ewlekarî yê Dewletê, ji súcen yekane re 48, ji yên siyasi re ji 15 roj, li Herêma Rêveberiya Taybeti ev dem dê 2 qat be.

Weke ku tê zanîn hikûmeta Demirel û Înönü berî hilbijartîne di sozên ku ji bo iktidarbûnê didan gel de, guhertina vî qanûnî ji hebû. Guhertina vî qanûnî bû tiştî zarûrî. Ji serî pê ve li ser van guhertinan Koalisyon û Wezareta Edaletê ev guhertin weke gaveki baş ji bo demokratikbûnê derpêşî raya giştî kirin. Lî ev guhertin, ji ali naverokê ve eynî ú yê çêbûn ji şıklî man. Belê van rastiyan xwe di reaksiyonen sazî û kesen demokrat de nişan dan. Û bi vî awayî maskeya Tirkîyê ya "demokratikbûnê" ji edî ket.

Li hember vê xapandinê ev kes ú saziyên demokratik dîtinê xwe wiha anîn zimên. Rêxistina Efuyê ya Navneteweyî: "Tirkîyê ku imze avetiye Peymana Mafen Mirovan ya Ewrûpa bi qebûlkirina vî qanûnî (CMUK) ev peyman ihlal kiriye. Skandala herî mezin ji ew-e ku, vî qanûnî li hember raya navneteweyî weke 'reformê' dide nişandin. Her tiştî li aliyeke, ev qanûn ji bo işkencya ku li kesen tewandarê adlı dibe; tedbirâ ku ji bo wan hatiye standin têra wan nake ú jixwe yê ku di çarçova anti-terorê de tê súcdar kirin ji bo wan tedbir qet nîn e."

Wezîrê Edaletê yê Tirkîyê Seyfi Oktay ji, ji bo qebûlkirina vî qanûnî wiha got: "Ev qanûnekî reformî ye. Bi biryara temamîn partiyen di meclisî de derketiye. Ev qanûn ji bo herêmén ku di nav sînorên rêveberiya taybeti de ne, wê ne eynî be. Ji ber ku li wir rewş û şertîn şer hene." Bi van gotinê Wezîrê Edaletê, şerî li Kurdistanê bi awayekî resmi hate zimên.

Serokê Komela Mafen Mirovan Akîn Birdal ji got ku: "Bi vî qanûnî polis dîsa dikarin işkencye bikin ú ji bo Tirkîyê ev ihlala imzekirina peymanen navneteweyî ye."

Wezîrê Mafen Mirovan Mehmet Kahraman ji ev qanûn mîna qanûnekî hemdemî nirxand. Qebûlkirina Qanûnê Usûlî yê Muhakemeyên Cezayî, beşek ji plana 'bi her awayî şer' ya şaxê hiqûqi ye.

## Dewlet û rojnameya Gündemê

**Navenda Nûçeyan-** Ji roja ku hatiye weşandin heta iro serê rojnameya Özgür Gündemê ji belayê xelas nabe.

An muxabirê wê tênu kuştin, birindarkirin an ji tênu girtin ú işkencikirin. Lî van metodê hovane ji ew neda sekinandin, vêca bi metodê din çûn bi ser ve. Ji bo ku Gündem negihîje destê xwendevanen xwe ú rastî neyên zanîn, şirketa belavkirinê hate tehditkiran, li geleç deveren Kurdistanê kamyonen belavkirinê hatin sekinandin ú şoférén wan hatin tehditkiran. Ev kirinê hovane ú tehdit hê ji dewam dikin. Ev kirin giş, bê guman, ji aliye hêzên dewletê ve tênu plankirin ú bi navê hêzên tarî, hizb-i kontra ú hwd. ve tênu pêk anîn.

Ev meheke zedetir e ku hêzên tarî ji bo belavkirina rojnameyê

dibe astengeke geleke mezin. Rojnameya Özgür Gündem, ji

roja ku derketiye heta niha, ji ni-vîskar û muxabirê xwe çar şehîd

dane. Hêzên tarî dîtin ku bi kuştinan rê li ber Özgür Gündemê nayê girtin, berevajî hîn xurttir dibe ú zedetir tê firotin. Van rojê dawî, astengiyen ku derdin pêsiya belavkirina Gündemê, zêde bûn.

Di 23'ê Mijdarê de 3 kesen erişker digirin ser Hasan Özgün û Mehmet Şenol. Mehmet Şenol bê birindarî difilite, Hasan Özgün birindar dibe, lî birîna wî ne xedar e.

Di ser vê erişê re saetek û nîv derbas dibe hêja polis têni cihê bûyerê, demançekê dibinin û li ser vê yekê radibin Mehmet Şenol digirin û dibin qereqolê. Dora rojê Mehmet Şenol bi súcdar-kirina bikaranîna yê demançê, derxistin mehkemeyê. Di celso yekemin de Mehmet Şenol hate berdan.



Kontrgerîla rojnameya Özgür Gündem ji xwe re kiriye hedef. Ji bo rastiyan ji xelkê veşerîn; naxwazin Özgür Gündem, Welat û Yeni Ülke werin belavkirin ú xwendin. Di wêneyê de erebeya ku kontrgerîla gulebaran kiriye xuya dibe.

## Rojnameya Hürriyet: Dengê MIT'ê

**Navenda Nûçeyan-** Rojnameya "Hürriyet" ê, di roja 22.11.1992 an di manşeta xwe de nûçeyekе balkê weşand. Li gor vê nûçeyê Serokê Partiya Karkeren Kurdistanê Abdullah Öcalan, bi telefonê ji hin navandan re talimat bi rê dike ú daxwazên xwe tîne ziman. "Hürriyet", fotografekî ku jê nayê fêmkirin ki ye ji weşand. Li gor "Hürriyet" ê, axafînek vî mirovî û Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan yê bi telefonê, di qasetek de, bi quryeyek partiyê re tê zeftîkirin ú li avahiyê MIT'ê pisporêvî vî karî li ser qasetê dixebeitin, dawî tê fêmkirin ku ev deng yê serokê PKK'ê Abdullah Öcalan e. Li gor "Hürriyet" dinivise, Abdullah Öcalan, hema bêje ji hemû

avahî ú rojnameyên ku an Kurdîn, an ji li ser mesela Kurdî, bi a-wayekî objektif weşanê dîkin re, talimat dişine ú ji bo hin karan, hin navan tesbit dike. Lî qurye kî ye? Ji bo ci pêwîst dîtine axaftinek telefonê bigirin qasetê? Nayê fêmkirin.

Dema nûçê bi temamî tê xwendin, diyar dibe ku, ev nûçê di avahiyê MIT'ê de ú ji ali pisporêvî şerî taybeti ve hatiye amadekirin. Lewre, ji mebûsênPKG (HEP)'ê heta Enstituya Kurdi ú "Özgür Gündem" ji, bi vê nûçeyê, dibin hedefa dadgehîn (mehkemeyen) Tirk. Dewleta Tirk, bi van provakasyonan dixwaze qetliama xwe ya ku li Kurdistanê dimeşîne meşrû nişan bi-

de û bi van listikên wiha ji, bingeha qetliamên nû ava dike.

Çapemeniya Tirk, wek weşanen MIT'ê kar dikan. Gelek rojnamevan û nivîskarên van rojname û kovaran, raste rast bi MIT'ê ve girêdayî ne. Bi gotina M. Ali Birand "pêşî ajan in, dû re hê, rojnamevan in" Senaryoyen ku di vê avahiyê de tê amadekirin, ji van rojnameyan re dibin manşet û karê şîlokirina rojeyê dibe peywira (wezîfeyâ) van rojnameyan a bindîn.

Çapemeniya Tirk, di şerî taybeti de, cihekî girîng digire. Ev parçeyek ji şerî taybeti û yê psikolojik e.

Mebûsên, PKG'ê li ser vê nûçeyâ "Hürriyet" hin beyan we-

şandin ú tekiliyek bi vî rengî red kirin. Mebûsê Pirînê (Adiye-manê) Mahmut Kılıç, beyanek da çapemeniyê û vê nûçeyê wek senaryoya MIT'ê nîrxand.

Di çapemeniya Tirk de, bi taybeti rojnameya "Hürriyet" ê, di weşandina senaryoyen MIT'ê de serî dikşîne. Berî vê nûçeyê ji, geleç derew û iftira ji, di nav rûpelân "Hürriyet" de hatibûn weşandin. Weke tekiliyên PKK'ê ú mafayê, bazırganiya eroîne û hwd.

Xuya ye, dê "Hürriyet" vê peywira xwe ya ajaniye bidomîne. Lî, gel edî bi rengê van rojnameyan hisiye û naxwîne. Lewre ev rojname dixwazin xwe bi lotarya û qumarê xelas bikin.

## Di gel hemû astengiyen çalakiyên NCM'ê

**Navenda Nûçeyan-** Navenda Çanda Mezopotamya, hefteya çandê ku di navbera rojê 14 û 21ê Mijdarê de li dar xistibûn de gel hemû astengî û rîlibergirtinan û pêkutiya dawleta Tirk, bi awayekî serkeftin, pêk anî.

Çalakiyên ku bi navê "Hefteya Çandê" hatibûn amadekirin, bi giştî li ser çalakiyên muzikî, şano, wêne, govend, semîneren der barê çandê, muzikê û hwd. de bûn. Hefteya Çandê li Navenda Çanda Mezopotamya, di 14'ê Mijdarê de vebû. Vebûna hefteya çandê bi tabloyen wênekarên Kurd ku çalakiyên xwe li Navendê didomin dest pê kir. Navend, ji bo ku çalakiyên xwe pêşkeşî girseyeke mezin bike li Pendikê ku navçeya Stenbolê ye, Pendik Atatürk Kültürevi kirê kîribû. Lî karbdesten Tirk ên emniyetê bê sebeb destûr nedan pekanîna çalakiyan. Navend ji, konferansî li ser muzik, govend û çandê di avahiya xwe de di gel

gelek zor û dijwariyan pêk anî.

Ên ku di konferansa çandê de axîfîn; Serokê Navenda Çandê İbrahim Gürbüz: "Girîngiye dema nû, afîrandina mirov û mirovahîya nû, zîmanzî Feqe Huseyîn Sañîç: Afîrandina berheman bi zîmanç Kurdi, peyvandina zîmanê Kurdi, Wêjîvan Abdurrahman Durre; li ser peywira ronakîrên Kurdi, Yavuz Binbay; komîkirin û civandîna nirx û hêjâhiyên gelêri û qeydkirin û arşîvkirina wan, Serokê Navenda Çanda Amedê Haki Özbeý; peywira saziyên çandî û girîngiye wan, endamê YRWK'ê Beşîr Botanî ji li ser berhevîkirin û komîkirin û civandîna nirxen çandî li ser wesfîn ronakîrên Kurdi rawestîya.

Foklorist û muzisîyen Beşîr Botanî ku ji Kurden başûrê Kurdistan, bajarê Zaxo ye, der barê govend, muzik û şanoja Kurdi de geleç hay û agahîyen hêja bi mînak pêşkeşî beşdarvanan kir. Bi taybeti ji li ser zargotiniya

(folklor) deveren Botan rawestîya û pisporbûna xwe bi mirovan da pejîrandin.

### PESTA Lİ SER ENSTİTÜYA KURDÎ

Enstituya Kurdi, ji pest û pêkutiyen dawleta û "hêzên tarî" naseqire. Di 15.11.1992 an de polis cerdi ser Enstituya Kurdi kiribûn, 5 kes tevi belge, bermayen dirokî pirtük û destnîvaran enstituyê xistibûn bin çav.

Di 21.11.1992 ar de ji derê ensitîtu yê tê şikandin û lêgerin di hundir de ji ali "hêzên tarî" ve tê kirin. Çapemeniya Tirk ji vala namîne û ew ji cihê xwe li nik wan kesan distîne. Rojnameya Hürriyet bi nûçeyek virr û derew erîş dibe ser sazî û sazgehîn Kurdi. Ew hemû tişt û kirin şanî "Herkata hundîrin" bi xwe ne. Niha ji amadîhî ji bo operasyonan têne kirin.

## Girtina HEP'ê tê xwestin

Amadehiyên ji bo girtina HEP'ê (Partiya Keda Gel) ber bi temambûnê ve diçin. Di dosyeyâ der heqê girtina Partiya Keda Gel de gelek sucdařî hene.

Weke tê zanîn ji ber kongreya awarte ya duyemîn a HEP'ê ji hêla Serdozgeriya Enqerê ve, der barê girtina Partiya Keda Gel de gelek sucdařî hene.

Di îdeanameya Serdozgeriya Enqerê de gelek sucdařî hene. Her wekî "xebatêni li dijî yekbûna mîlet û welat", "Şandîna militana ji bo PKK'ê" "Nîşandîna aliyeke Tirkîyê, bi navê Kurdistan", Partiya Keda Gel ji avabûna xwe ta niha, ji dawe û dozên wiha neseqiriye. Biî girtina HEP'ê 18 mabûsên wê ji, niha têne mehkemekirin û idama wan tê xwestin.

*Bi rewşenbîrê Kurd Mihemedê Dewran re hevpeyvîn:*

# 'Divê sînorekî teze di Kurdistanê de çênebe'

- Em dikarin te bi xwendevanên  
Welat bidin nas kirin?

Navê min Mihemedê Dewran e, di sala 1933 an de, li Nizibê, li gundê Cahûdê (navbera Rûhayê û Kilisê) hatime dinyayê. Bâvê min têye Başûr-rojavayê welêt û gundekî ava dike, jê re dibêjîn Eli Begê.

- Te xwendin kiriye?

Min li Bakur û li Başûr-Rojavayê neh sala xwendin kiriye. Paşê, ez ketime hucran, li ba melayan, min bi zimanê Kurdi, Farsi û Tirkî dixwend. Bâvê min jî bi xwe ew ziman xwendine. Di sala 1958 an de ez bûm endamê PDK-Sûriyê. Sala 1963, ez çûme Başûr, li Zaxo, min dîsa di hucran de xwend.

- Te kî ji avakarên PDK'ê nas dikir?

Hevalên me Osman Sebrî, Dr. Zaza, Reşidê Hemo, Hemîdê Derwîş, Mihemed Eli Xoce û Şewket Henan bû.

- Tu weki endam di PDK'ê de bûyi?

Ez endam bûm, ji min re digotin N 1. Sala 1958 an em ji ailiyê Cemal Ebdil Nasir ve ku hîngê li Sûriyê ji desthelatdar bû, hatin girtin. Hê Mele Mistefa ji xwe li Taşqend bû, li Tiflisê bû. Partiya me liqekî ji partiya Mistefa Berzanî bû. Her ferman û nîvisarên me ji wir dihatin. Navê partiya me wê çaxê Partiya Demokrat a Kurdistanê bû; armanca wê serbestkirin û yekbûna Kurd û Kurdistan bû, ne ji bo otonomî bû, ne ji bo develekê bû. Hîngê salek girtin li min ket. Ji ber ku umrê min biçük bû (17 sali), ez şes mehan girtî mam. Hevalê min her yekê salek an sal û nîvekê girtî man. Pişti girtinê, partiya me bû du parce. Reşid Hemo xwest partîyeke navkurdistanî ava bike. Me berdewam kir, lê zor li ser me çû, em rabûn çûne Bêrûdê, ez û Dr. Zaza û hin hevalên dinê. Me destê xwe ji parçê Başûr-Rojava kişand. Me xwe bi PDK a Iraqê ve girê da. Hîngê İbrahim Ehmed û Celal Telabani li ser PDK bûn, Berzanî li derve bû.

- Tu çigasî li Bêrûdê mayî?

Ez şes heyvan (mehan) mam. Carna ez vîdigeriyam Başûr-Rojava, carna ji Bakur. Sala 1962, ez çûme bakurê Kurdistanê, ez salekê mam. Ji mirovên min jî hin niştimanperwer hebûn; li wê derê me xebateke xwe ya taybetî dîkir. Me destnivîsên kevin kom dikirin, me dixwendin û min ew di gundê xwe de vedişartın. Ji wan destnivîsan min gelek bi xwe re birine Başûr.

- Destnivîsên kî we peyda kîrin?

En Mela Mehmûdê Beyazîdi

bûn.

- We dane çapkîrin, an na?

Min ew spartine Yekîtiya Nîvîskarêni Kurd li Başûr. Paşê ji em revyan û ew di destê Ereban de ma.

- Hîn ên kî hebûn?

Ên Mela Necmedînê Xanikî ji gundê Heftrengê bûn. Me hinek ji di mizgefta Amedê de peyda kirin. Me ew li mala Mehmûdê Denizî hiştin. Me hindek ji li Cizîra Botan, li Rûhayê, li Qirika, li gundê Kertûşê, li mala Hebê Hebirman kôm kirin. Şes mehan bi şûn ve, ez bi dizî vegeŕîme Başûr-Rojava. Min hin destnivîs bi xwe re biribûn, min hinek ji li Bakur veşartin. Gava min Dr.

Nûrî Dêrsimî dit, gote min ku ez destnivîsara ji Mele Hesenê Kurd (Reşidê Kurd) re bibim. Hin destnivîsar bi Farisi bûn ji, ne dihatine xwendin. Rabû Reşidê Kurd ji Mele Zivingî re birin, wî ji nikaribû bixwendana. Sernîvîsa yek ji wan destnivîsan heya niha têye bîra min: Xunçey biharistan, yan tarîxi Kurd û Kurdistan. Me ew li cem melayekî dit, nav li ser tune bû, me dikarî ew bixwenda. Me ew da Meleyê Zivîngî.

Berzanî ji derve hat û pê re şer disa dest pê kîr. Min ji Nûrî Dêrsimî re got ku, ez dixwazim herim şoreşê. Nûrî Dêrsimî gote min: Ezê te bişînime Cizîrê ba

Mele Hesenê Kurd (Reşidê Kurd). Ew ji wê te bibe gundeki min li ser sînor heye, wê te derbasî Başûr bikin. Nûrî Dêrsimî kaxezek ji Necmedîn Ewnî re şand, birayê Mihemed Eli Ewnî yê kî pirtûka "Kurd û Kurdistan" li Misirê wergerandî Erebi û da min.

- Te pirtûk li Başûr-Rojava da çapkîrin?

Belê, sala 1961 i, min dora 800 gotin ji Kurdi wergerande Erebi û li çapxana Ermeniyekî, navê wê Anî, bi tipen Latînî da belav kirin. Wî pirtûka Dêrsimî ji bi dizî çap kiribû. Paşê, hikûmet jê agahdar bû û çapxana wî ji bona me salekê dane girtin û bira-

derê Ermenî ji kirin girtigehê.

- Navê te li ser pirtûkê..?

Min navê xwe "Mamoyê Kurdi" li ser pirtûkê danibû. Pirtûka min bû sedemê ku Nûrî Dêrsimî ji were naskirin. Min 500 hejmar ji pirtûka N. Dêrsimî bire gundê xwe yî li Bakur û min li wir da belavkirin.

- Ji kerema xwe re çela behsa çûna xwe ya Başûr bike?

Ez çûme mala Reşidê Kurd, min zivistan li wir derbas kir. Rêzimana xwe jî, ji me re tim şîrove dikir. Digote me: "Ez pîr bûme, nema ji min tê. Lî divê ez tiştekî ji Kurdan re li pey xwe bîhîlim. Ez hez dikim zana di pey me re hebin.." Paşê, ez hatime gundê Dêrsimî, li ser pişta hespê ez derbasî Başûr bûm. Ez li gundekî Ézdiyan peya bûm. Navê wî Welîdiyê bû. Dest bi dest ez gîhîstîme bargeha Ezed Xoşewî. Pişti şes heyvan, ez gîhîstîme Salih Yûsîfi, endamê Buroya Politika PDK...

- Te di kovara "Biratî" de kar kiriye?

Hezîrana sala 1967 an, peymaneke teze di navbera şoreşê û serok wezîrî Iraqê Ebdilrehman Bezaz de, çebû. Wê demê, em hatine Bexdayê û "Biratî" bi serdariya Salih Yûsîfi hate belavkirin. Ez bûm reqîb û berpirsiyare beşê Kurmancî û Refîq Çalak, berpirsiyare ragîhandin û çapemeniyê di buroya politik de, bû yê beşê Soranî. Paşê, Refîq Çalak çû û Seîd Nakam şûna wî girt. Hîngê, ez bûme endamê Yekîtiya Nîvîskar û Rojnameyên Kurdistan-Iraqê û mir cinsîya Iraqê stand. Pê re, ez bûme endamê Komîta Komîkrina Navê Şehîdan û endamê Komîta Çapîke-tina Girtian.

- Salih Yûsîfi ji kuştin?

Belê, Sedam Husên ew kuşt. Berî ku aş betal bibe bi demeke kurt, S.Yûsîf û çend kesen dinê li dijî Şahê İranê nîvîsand û xwestin ku bi ci awayî be xwe bi Iraqê re li hev bînin. Sedam pêşî ew efû kirin û paşê ew yek bi yek kuştin.


- Hûn niha nêzîki kîjan riyê ne?

Ez bi xwe 30 sal in ku hevalê PDK-Iraqê me. Min nikarî tê de berdewam bikira, ji ber ku xebateke navçeyî (herêmî) dike. Ez dixwazîn jîyana xwe ya paşîn di riya PKK'ê de derbas bikim.

- Tu ci çi çapî li şerî ku li Başûr dibe dinêri?

Gava du parti şer bikin, yek ji wan dest dirêj e. Ev 30 sal in em li Başûr in, şer dikin, em tim birçî bûn. Ji bo pemcke sekir û birincî mirov dijminayetiyê di navbera Kurdan de peyda nake, sînorekî teze di Kurdistanê de çenake.

Hevpeyvîn: Amed



Ev 30 sal in em li Başûr in, şer dikin, em tim birçî bûn. Ji bo pemcke sekir û birincî mirov dijminayetiyê di navbera Kurdan de peyda nake, sînorekî teze di Kurdistanê de çenake.

Wêne: Fevzi Bilge



Zanayê ku bi çakî hatibe  
nasîn, divê milahîm, bi tebat û  
pêagahê tiştan be.

Ehmedê Xanî

# Her tişt li bejna we tê

Hefteya me li pey xwe hişt, rojén ïnê, şemiyê û yekşemê em çûn sindoqan û me dengên xwe dan û berendamên Meclîsa Neteweyî hilbijartin.

Roja hilbijartina berendamên Meclîsa Neteweyî dest pê kir, yanî roja 20'ê mehê li Asogim-nasîyûmê parlementerên Meclîsa Mesûd û Celal ji bo xelkê semînerek çêkirin.

Semîner qelebalix bû, salon mişt bû ïji giş aliyen Swêdê gabîtilî, dawşiyayı û hin kesên xwe bêxwedî û bêwelat û bêne-tewekirî hatibûn.


Piştî ragihandina qerareke antîdemokratik û paşverû ku mafê minaqeşekirinê û pirskirina bi deng ji besdâr û guhdaran hate standin, semîner dest pêkir.

Dî semînereke 4,5 saetî de parlementerên hikûmeta Başûr ji aş û baş qise kîrin, li dora şerê nav PKK û serokên Başûr çûn û hatin, bi saetan perişantî û şe-perzetiya ku ew jê re bûne se-beb hejmartin, carna hewar û gaziya xwe gihandin dinyayê, carna bûn diz, carna cinew û xeber ji xwe re kîrin, û nalet li xwe anîn. Û ne kêm caran ji bûn qebeyî.

Parlementerê birêz Saïdî û Cewher Namik wiha digotin: "Xerabî nemaye û me nekiriye, guneh tune ku em nas nakin." Bi rûyekî şûştî û bê şermane di-domand Saïdî "PKK sînorê nav Kurdistanê nas nake, bi me dixwaze em şerê çar dewletan bikin û geleki li ser baweriya bi xwe disekekin. Baweriya me bi tiştîn wiha tunê. Ev tiştîn xeyâli û kitêbî ne. Bi xwe gotinê vala û qiseyên qor in. Serxwebûn xewn e û hê wekî din."

Di vê navê de, gotinê Mîrza Saïdî hin gotinê Dr. Mehîmûd Osman anîn bîra me.

Piştî hilweşîna rabûna Berzaniyê mezin û trajediya salên 70 ï, Mahmûd Osman hatibû Swêdê. Sal 76,77 bû niha tam di bîra min de nemaye. Semîner li bajarê Upsala li salineke ji yê blokê Floksta bû. Dr. bi ecêbmâyîneke mezin behsa xwe kêmkirin û xwe biçûkkirina Mistefa Berzanî dikir, gava ku bi hev re çûbûn ba Şahê Iranê û pişt re ne bi geleki dema gotinê xwe qedandin ev ji libo libo got: Heger em li welateki din bûna heta niha em dê çend caran bihatana idamkirin. Xiyaneta ku me kîriye kesi nekiriye."



Di van salan de Saïdî ji di nav rezên komeleyên xwendevan de, di nav AKSA de li Avusturya kar dikir ïjê dizanî ku wê rojekê bibe parlementer û dê semîneran bide.

Divê ji Saïdî û giş parlementerên ku mîna. Saïdî difikirin û giş serokên başûrê Kurdistanê bê pirsîn delîlîn we ci ne ku baweriya bi xwe xewn e û bi xwe-nebawerî baş e?

Hûn dikarin ji kerema xwe re ji derbasbûna mejî û felsefeya xwe, siyaset û pratîka xwe ya deh sal û bîst salan nimûneyekê bi tenê bidin ku hûn mîna siyasiyên ne bi xwe, belê bi derve baver, bi serketî ne?

Heger xulamtî, bi xwe bawernekirin û çavliderî serketinê tîne hûn ji zemanê erzanî û vir ve çiqasî serketine.

Hûn xwe serketî hesab dikin?

Hewar hewara xelkê ji néza ïjî sermayê ye. Hûn nikarin meaşê çend mamosteyên ku bi şev û roj kar dikin bidin wan, çend sed hezar Kurdîn me li sikak û tunelbanê Moskovê û Urdinê radizin. We giş xortêne me kîrine heyranen împeryalîzmê, we giş apolitîk kîrine, tu iro sînor veke yek ji wan li welat namîne, xelk wîzeyen derve bi dolaran difroşin xortêne me li Hewlîr ïjî bajarê Kurdistanê. Herkes ji welat direve. Roja çend însan li vir, li dera han neyîn kuştin tune, we televîzyona Kurdi giş daye mîrovê mîna Bûlent Ersoy, Küçük Emrah û İbrahim Tatlıses. Kultur, exlaqekî pîs li ku be, we deriyen xwe jê re heta bi piştî vekrine ïjî we ye ku hûn bûne tiştîkî û qaşo we dewlet ava kîriye. Û hûn PKK û naecibînin û êrisê dibin ser, hûn henek

û qesmeriyen xwe bi serxwebûn û azadiyê, bi baweriya bi xwe û serbilindahiyê dikin.

Diyar e ïjî bo we giş prensîp, nav û mefhûm bi mîzînên din tîne wezinandin. Mîzîn û pîvanen we, ji bo baş û xerabûnê, serketin û binetinê ne mîna yê mîrovê cîhanê ne.

Hûn ji herkesi re serî datinîn, hûn ji herkesi re serî ditewînin û di şekalîn Özal û Eşref Bitlisî de avê vedixwin.

We dev ji Kerkûkê, Xaneqîn û Mendeli berdaye. Cewher Namiq ji bo Mûsilî, "Ew bajarî Iraqî ye" dibêje. Ji bo Kerkûk Xaneqîn û Mehîdîli ji ne dû re hûn tiştî ku ji bo Mûsilî dibêjin ji bo wan ji nebêjin.

Her tişt li bejna we tê.  
Parlementerên Başûr!

Felsefe û pîvanen we ji we re pîroz bin. Hûn baweriye bi xwe neynin. Li serxwebûnê wek xwe binêrin û ji hembêza dagirkere-kî têkevin yeke din. Hûn bi kîfa xwe ne.

Belê em ji serbest in, em ji a-zad in. Emê ji herdu desten xwe bi bawri, bi xwe ve bidin û emê piştî xwe tim bidin gel û welatê xwe.

Pratîka me ji, ji ya we cihê ye. Em dibinin di çend salan de em ji ku hatin ku, em çawa bûn gel, mîlyon û serhîdan û em we ji dibinin we welat û gelê me li Başûr xistiye ci halî.

Biji baweriya bi xwe.

Mîrovê bi xwe bawer, mîrovê bi rûmet û xwedî qedr e.

Mîrovê bi xwe nebawer cihê wi nav sol û şekalîn ber deriyê xelkê ye.

Nav şekal û solan pîroz be li we, pîroz be li we.

Mîrhem

## TÎR

Musa Anter



### Xal Musa, to ganî remayışê dizdan bidînî

(ZAZAKÎ - 3)

Fîkrê yê modern û newey bî. Nê fikrandê xwi ra qewet û cesaret girewtinî. Têkilî yê cemati reydi tim û tim geş bî. Bi xwi bawer bi. Beyntardê bawereydey cê û stilê heyatê cê di, yew harmoniyo weş bi. Bi maqalanê xwi rayirê lejî şarî nawitinî û yo bi xwi, bi ay emrê xwe kewtinê grevanê veşaney, mitîng û protestoyan. Hezey qorê roşanbîranê ma, yê bi name bê roşanbîrey xwi beyntardê çeher dîsan di, hepis nêkerd. Roşanbîreya ki şarî ra, cengê azadî ra û Kurdîstan ra durî bi, Xal Musay ra zî durî bi.

Xal Musa, tenya yew roşanbîrdo bi wîjdan nêbi, yo yew hepsi yo camîrdek bi zî. 35 rayî kewt heps. 1959 ra hetanî 1961 Xal Musay zîndan di bi. 1970 ra pey zî Xal Musay 33 aş-mî hepis di mend. Sewbî zî gelek rayan Xal Musa tepşa. Hepsî-yeş heyatê Xaldê ma di, bî yew periyodo muhîm. Birîna Reş zî berhemê nê periyodî ya.

Ez wazena nuştarey xwi yew meseladey Xal Musay reyra biqedêno. Yew reportaj di, yew nuştox Xal Musay persoно û vano: "Siyasetdê Tîrkiya eyrûyên ra ci hêşdê to kuweno? Hişyarbiyâşê Kurdan senê no?"

Xal Musa cewabê cê bi na mesela dano û vano:

- Dîzd kuwenî yew keye. Keye di cenî û camîrda teber yew zî gedey yînî çeherpanc serre beno. Cenêk û mîrdekk rakewte benî, labelê lacek bi rep û tepey dizdan reyra xwi aqilêno. Dîzd kardî kaş keno û lacekî tersenono ki vengê xwi nêko. Lacekê to semedê mar û pîrê xwi hişyar bîkaro û vano: "Aw, aw, aw!" Dîzd ra yew lacekî ra vano "Herow hiş bi, hiş bi!" Dîzd bî vano "Çî nêbeno biyari aw biderdi." Lacek wexto ki aw weno vengdê berz reyra vano: "Oxx, oxxx, oooxxx" Labelê, may û pî hewna xwi nêaqlînî. Dîzd hêrs beno û vano û vano" ez nîka dano fekdê to ro: "Lacek bareno vano" Ay fekê mi, ay fekê mi... "Na ray May û pî lacekî hişyar benî û dîzd zî remenî.

Tira pey Xal Musay vano: "Nika ey ma ya. May û pî hişyar biyi. Rew ya zî erey do dizdî biremi. Sewbî rayirê dizdan çinî yo" Qali qaley Xal Musay ya. Ma hinî ne hewenî û ne zî ronî.

Key felekî veşo! Ganî Xal Musay remayışê dizdan zî bidînî.

J. Esper

# Salvegera PKK'ê bi meclîsê xemilî

14 sal berê, şitlên serxwebûn û azadiya gelê Kurd, ji aliyê Partiya Karkerêne Kurdistan ve pêşî li bakurê Kurdistanê hatin çandin, dû re şitil zêde bûn û li çar aliyê Kurdistanê hatin çandin. Di 14 salan de civaka Kurd qalikê xwe guhert, ew gelê ku ji hev ketibû û bûbû biyaniyê xwe, bi corekê xwe nû kir û dil berda serxwebûn û azadiyê. Bi pêşengiya Partiya Karkerêne Kurdistan, ev têkoşin her diçê bi hêz û xurt dibe. Di 14 salan de lehengiya gerîlayen ARGK'ê û xebatên ERNK'ê bûn dinamîzma veguherîna civaka Kurd.

## SADIMANIYÊN SALVEGERA DAMEZIRANDINA PKK'Ê

Salvegera damezirandina Partiya Karkerêne Kurdistanê ya 14'an li welat, li derveyi welat û li metropolên Tirk bi meş, xwepêşandan û bi coşke mezin hate pirozbahîkirin. Li Edenê û Stenbolê, meş li dar ketin. Li Stenbolê, Aksaray grubek bi pankart û slogan meşyan. Li Edenê li taxên Dağhoğlu û Denizli meşen girseyî çebûn. Polis mudahaleyi meşvanan kir, di vê navê de, erebeyeke polisan hate gullebarankirin û 2 polis birindar bûn. Trafoyeke ceryanê ji, bi bombeyan hate imhakirin.

Pirozbahîyen salvegera damezirandina PKK'ê li gelek gund, navçe û bajarêne Kurdistanê ji, bi coş û heycaneke mezin didomin. Li Batmanê, bi beşdariya hezaran kesan ve ûn ji bajar, gund û navçeyen der û dor hatibûn meşek girseyî li dar ket.

Polis û leşker, gulle reşandin ser meşvanan, hejmara birindaran nayê zanîn, bi dahan kes ji hatine girtin. Li Cizirê ji, gel bidef û zirne û bi govendê salveger pirozbahîkirin. Li Diyarbekir, Dêrsim, Cizir, Qoser (Kızıltepe) Silopi, Derik û li gelek navçeyen din, esnaf dikanen xwe

girtin. Li Diyarbekir meş li dar ketin. Li dibistanan ji xwendekaran ders boykot kirin û bi coşke mezin salvegera 14 salan damezirandina Partiyê pirozbahîkirin.

Nûneriya PKK'ê ya Ewrûpa ji, ji bo salvegerê daxuyaniyek belav kir. Di daxuyaniyê de, qala salvegera 14 an û avakirina Meclisa Neteweyî tê kirin. Daxuyani wiha didome: "Partiya Karkerêne Kurdistan, ji her demê berfirehtir û tundtir şerê serxwebûnê didomine. Ev şer bi avakirina Meclisa Neteweyî ve gihişte qonaxek bilind. PKK bi vê hişariya gel a mezin ve, meşa serfiraziyê di 15 salan xwe de dest pê dike û dê ev meş bi biryara serfiraziyê bidome."

## PIRRANIYA KURDAN CÛN SER SINDOQAN

Di diroka Kurd û Kurdistanê de, ev cara yekemin e ku gelê Kurd, bi vîna (iradeye) xwa ya serbest, ji bo hilbijartînê, bi tevâyî diçê ser sindoqan. Rojén 20, 21 û 22'ye meha Mijdarê li çar parçeyen Kurdistanê, li welatên Asyaya Navin û li Ewrûpa, gelê Kurd delegeyên xwe hilbijartîn. Der heqê encama hilbijartina li Kurdistanê û li welatên Asyaya Navin, me hina tu agahdarî negirti-

ne. Ji ber vê yekê, em dikarin tenê encama hilbijartina ku li Ewrûpa li dar ketiye, pêşkêş bikin û binirxinin.

Hilbijartina delegeyên ku ji nav xwe nûneren Meclisa Neteweyî wê hilbijîrin, li 35 deveren Ewrûpa li dar ket. Di vê hilbijartînê de, ji 421 berendaman 153 kes weke delege hatin hilbijartîn. 87.719 hilbijîr beşdari hilbijartînê bûn. Ji van 87.719 rayen ku hatine bikaranin, 926 heb nelê derektin û nehatin qebûkîrin. Ji 153 delegeyân 27 heb ji jin in.

Her çiqas, ji ber kemasîyên tekniki û ji ber ecmîtiyê, di vê hilbijartînê de astengiyen giřing derketibin ji, ji sedi 50 hilbijîren Kurd ên li welatên Ewrûpa çûne ser sindoqan. Ji ber vê yekê %50 beşdari wck serfirazî tê nîrxandin. Delegeyên ku hatine hilbijartîn de dawîya hefteya pêşin a meha Kanûna 1992'an de wê beşdari hilbijartina nûneren Meclisa Kurd a Neteweyî bibin. Ji van 153 beşdaran 15 nûner wê bêntesbîkîrin û ev 15 kes wê nûneriya hemû Kurdên li Ewrûpa bikin.

Weki hemû welatên Ewrûpa, Kurd û Kurdistanîyên Îskandinavîyê ji di rojén 20, 21 û 22'ye meha

14 sal piştî salvegera damezirandina Partiya Karkerêne Kurdistanê gelê Kurd ê ku xwe ji rihê koletiyê xelas kiriye û ji bo serxwebûnê ketiye rê, gaveke pirr giřing di meha Mijdarê de avêt. Ev gava giřing di warê damezirandina Meclisa Kurd a Neteweyî de bû. Roja 20, 21 û 22'ê Mijdarê, gelê Kurd ji bo hilbijartina delegeyên Meclisa Kurd a Neteweyî çû ser sindoqan. Li Ewrûpa, bi beşdariya nêzîkî 90 hezar Kurd, 153 delegeyên Kurd hatin hilbijartîn. Ji 153 delegeyân, wê 15 nûneren meclîsê bêñ hilbijartîn.

Mijdarê de çûn ser sindoqan û dengê xwe dan. Di vê hilbijartînê de, Kurd û Kurdistanîyên İskandinavîyê ji bo Meclisa Neteweyî 11 nûner hilbijartîn, 5 nûner ji Swêdê, 3 nûner ji Danîmarkayê, 2 nûner ji Norwecê û nûnerek ji ji Finlandiyâwê wê li Konferansa Ewrûpayê, Kurdistanîyân temsil bikin.

## BEŞDAREN HILBIJARTINAN

Li gor agahdariyên ku me ji berpirsiyare Komisyonâ Hilbijartina Meclisa Neteweyî yê Ewûpa standiye, hemwelatiyên me yê ku li İskandinavîyê beşdariya hilbijartînan bûne 6208 kes in. Ji wan 3073 kesi li Swêdê, 2155 kesi li Danîmarka, 691 kesi ji Norwecê û 289 kesi ji Finlandiyâwê çûne ser sindoqan.

## DENGÎN HERÎ ZEDÊ

### Jİ JİNAN RE

Di van hilbijartînan de hin tişten balkêş derketin holê. Ji wan yek ji helwesta Kurdan li hember jinan bû. Weki ku tê zanîn li Swêdê, du jinê berendam hebûn. Yek ji wan Seta Bakirciyan ew bi xwe Ermeni ye, ya din ji Nevîn Rewşen bû. Ev herdu berendam ji, bi dengê gelek zêde hatin hilbijartîn. Seta Bakirciyan, ji 3073 dengan 1793 deng girt, Ne-

vin Rewşen ji bi 1259 dengan hâte hilbijartîn. Dengê ku sê berendamên din û Swêdê ji girtin wiha ne: Mirhem Yiğit 865, Fahri Bozkurt 822 û Robin Rewşen ji bi 816 dengan bûn nûner.

Ferqê dengan di navbera hevalen jin û mîran de xuya ye. Jinan nêzîkî dû qat-deng girtine. Ev rewşa han ji helwesta civaka Kurd a der barê jinan de dide xuyakirin. Bi vê hilbijartînê xuya bû ku Kurd weki civak edî itibar ji wan ditinê kevnarê na-kin-û wekheviya civaki diparêzin.

Neticeyâ din ku mirov ji vê bû-yerê derdixê ev e: Kurd biratiya gelan ji dil-diparêzin. Li hember gelên ku li Kurdistanîyên dîjin pirr bi tolerans in û tu ferqî naxin nevbera gelên Kurdistanîyân. Dengen ku Seta Bakirciyan stendiye ispata vê yekê ye. Di nava hemû berendaman de bi tenê Seta Bakirciyan ne Kurd bû. Lê Seta ji hemûyan zedetir deng stend.

## SEBÎ BOTANI

### NÜNERÊ MECLISÊ YE

Li Norwecê hozanê navdar Sebî Botani bi 246 dengan bû nûnerê Meclisa Neteweyî. Li Konferansa Ewrûpayê Mam Sebî Botani bi Yusuf Topalan ve hemwelatiyên me yê Norwecê dê temsil bike.

Li Danîmarkayê ji, Kemal Koç bi 962, Zeynel Çelik bi 921 û İmdat Yilmaz ji bi 831 dengan hatin hilbijartîn. Li Finlandiyâwê ji Orhan Aslan, bi 125 dengan weki nûnerê Meclisa Neteweyî hat hilbijartîn.

### "EM BI SALAN LI BENDA ROJEKE WIHA MAN"

Em ji bo çekirina programen radyoya Dêngê Serxwebûnî li ser sindoqan digeriyan. Me dîtineke ji-neke Kurd pirsî. Bersiva wê gelek kurt bû: "Em bi salan li benda rojeke wiha man, wa ye roja me hat, ma ez weki din ci bibêjim?"

Dibe ku ev hevok hisa hemû hemwelatiyên me dianî zimên. Cara yekemin, ji hemû parçeyen Kurdistanîyân, Kurd ji bo tayînkirina qedera xwe diçûn ser sindoqan û dengê xwe didan. Cara yekemin e ku kesan ditinê wan dipirî. Cara yekemin e ku ew ji weki gelên din der heqê pêşeroja xwe de dibûn xwedi gotin. Ji ber wî ji me li ser sindoqan dît, geleki hilbijeran dixwestin çaxa ku raya xwe didin sûretê wi/wê bê girtin. Piranî ji bi tedarik hatibûn, sûretê xwe wan bi xwe digirtin. Kelke dixwest vê gava diroki bike dokument.

Lokalên hilbijartînan bi alen kesû sor û zer, bi şiarên, "Biji Meclisa Neteweyî" bi kulik û sûretên şehîdan hatibûn xemilandin. Komisyonen sindoqan bi disiplin karên xwe dikirin. Di lokalê de, ji bo dengdayînê cihêñ taybeti hatibûn amadekirin. Hemwelati di wî warî de tu zehmeti nediditîn.

## 14 sal berê, iro û Meclisa Kurd

**H**er tişt li her der bê rawestin di-guhere. Ev guherîn her dem ne di eynî tempoyê de ye. Cîvak û mirov carna pirr hêdî, carna ji ewçend zû diuguherin. Cihê ku lê tevger û lebat heye, tempoya guherînê li wir zû dibe. Ji ber ku dînamîzma guherîn û veguherînê tevger û lebat e. Tempoya guherînê civakî girêdayê têkûzi, xurtî û qalîteya tevgerên şoreşer e. Di hin deman de civak û mirov welê zû diuguherin, gavêni wisa mezin diavêjin ku mirov devvekirî û heyretmayî dimine.

Gavêni ku gelê Kurd di van 14 salan dawî de avêtine mirovan şas dihêlê. Gelê Kurd veguherînê ku di pêvajoya sed salan de nikariye pêk bîne, di van 14 salan de pêk anye.

14 sal berê, Partiya Karkerêne Kurdistan damezirî. Dema PKK damezirî, gele Kurd di kîjan rewş û şertan de bû? Ji hingê ta iro bi giştî ci guherîye? Dema mirov civaka Kurd a berî 14 salan dide ber ya iro, mirov dikare bibêje ku taybetiyen van ên hevpar pirr kêm bûne.

14 sal berê, civaka Kurd civakeke rihkole, sertewandî, bi xwe nebawer, çavîdest, çavîlder, xwenezan, serhiş, birakuj, feedal, Tirkîhez bedbîn, dîtin teng, mirîdşêx, bêhêvî, xwespar û hwd bû.

Bi kurtî, di bin nîrên kedxwarî û da-

girkeriyê de gelê Kurd ê bê rêxistin ji mirovahîya xwe dûr ketibû.

Piştî 14 salan din, em li civaka Kurd dinîn, ew civaka rihkole çûye, yeke din hatiye şûna wê.

Civaka Kurd di 14 salan de tîrsa xwe şikand, xwe ji rihê koletiyê rizgar kir, êdî bi xwe bawer e û bi dil û can bê tîrs û xof têkoşinê li çar alîyan bilind dike. Di 14 salan de PKK, gelê Kurd ji serê wî heta piyê wî guhertiye.

Berî 14 salan Kurdistan, mîna dojeyeke warê kolejan bû. Zîlm û zor, perîşanî û belengazî dabû çokê, axa Kurdistan a pîroz bûbû warê berûmetî û birakujiyê.

Dijmin gelê kurd ber dida hev, eşîr û malbat diketin nav hev û xwîna hev dirîjandin, mala hev mîrat dikirin. Dijmin ji ew bi qîma dilê xwe hefsar dikirin û jî nîrxên mirovahîye dûr dixistin.

Li ser hêka kewekê an ji bo du zebeş û petêxekê, kî dîzanê çiqas kes hâtine kuştin. Ev Kurdên eşîr ên şeremêr ku li hember hev çavê xwe ji Ezraî nedînigandin li ber çawîşekî Tirk diketin rezê. Çawîşekî Tirk dikaribû gundek bi giştî bi saetan li ser piyekî bisokinîne û li wan işkencê bike.

Nîha, Li Kurdistanê, êdî çawîş an ji onbaşiyekî Tirk nikare gundek sax bide ber sile û pihînan. Iro Kurdekk bi tenê li diji cemseyeke leşker serî natewîne.

Kes êdî birayê xwe nakuje û bi tenê nahêle, rihê piştîgirî û azadiyê welî bi pêşketiye ku hemû Gund û bajarê Kurdistanê ji bo cenazê şehîdekî dikarin rabin ser piyan.

Ew zarokên ku heta berî 14 salan, alen Tirk û rismen Ataturk bi nezanî didan destê xwe û di 23'ê Nisanê de marşen Tirkî dixwendin, iro komîteyên xwe çedîkin, ala kesk û sor zer di destê wan de, geh panzer û tîmîn taybetî didin ber keviran, geh alîkarî bi gerîlayen serxwebûnê re dikin, geh ji di serhildanan de cihê xwe di refen pêş de distînin. Ew zarokên ku 14 salan xwe temam kirine û berê wan ketiye pazdehan, di nav têkoşîna çekdarî ya germ de gihiştine û her yek ji wan êdî şervaneke azadiyê ye.

Di salvegera damezrandina PKK'ê de gelê Kurd, bi rihekî nû bi mejiyekî hemdem li pey azadî û serxwebûnî dimeşe. Ji bo, bi rîkûpêkkirina xebat û têkoşîna serxwebûnê, gelê Kurd di 14 salan xwe şerîne û têkoşîne de ber bi Meclisa Kurd a Neteweyî ve dimeşe

14 sal berê, PKK'ê tovê serxwebûn û azadiyê li xaka Kurdistanê reşand. Ev tov şin hat, bejin avêt, mezin bû û gihiştî berbanga serxwebûnê.

Têkoşîna çekdarî ya gelê Kurd bi damezrandina Meclisa Kurd a Neteweyî ve wê bixemile.

# Batman: Ev tirs û xof ji ber ci ye?

**Batman, Welat-** Nêzîkê salak e li Batmanê roj bê kuştin derbas nabe... Roj tune ku mirovên welatparêz an ji yên pêşverû neyên kuştin. Tê zanîn ku ev kuştin tev bi destê hizb-i kontrayan û ji aliye TC'ê ve tên plankirin.

Roja ku koalisyon DYP û SHP'ê hate iktidarê "realita Kurd" nas kîrin. Ev naskirin bi kuştinan, qirkirinan û koçberkirinan dest pê kir. Iro ev politikayê wan bi destê hizb-i kontrayan tê pêkanîn û TC xwe li pişt van veşartiye. Lî belê TC xwe çiqas ji veşere, xwe ji van kuştinan re çiqas ji bêdeng bike, gelê Kurd dizane ku ev kuştin tev bi destê "hêzen tarî" yên TC tên kîrin.

## DESTPÊKA TIR SANDINÊ

Çawa hikûmeta koalîsyonê hate ser kar, pişti demeke kurt, li Amedê, li Batmanê û hwd. bombe, hatin avêtin nav mal û karxanên welatparêzan. Dixwaze wan ev bû, da ku mirovên welatparêz bitirsin. Bombekirin ji meha Kanûnê 1991 an pê ve zêde bûn. Di vê demê de buroya kovara Özgür Halk li Amedê, erebeya Sedik Tan li Batmanê (22 Heziran 1992 an de li Batmanê ji alî kontrayan ve hate kuştin) hate bombekirin. Pey de berê xwe dane karxane û dikanan.

Tenê li Batmanê di du hefteyî de 9-10 karxane hatin bombekirin. Hinek ji van ev bûn:

- 12, 13, 14 Kanûnê 1991: Hin dikanê ku ke-pengên xwe girtibûn hatin bombekirin.

- 21 Kanûnê 1991: Pir-tûkxana İslâm.

- 27 Kanûnê 1991: Lo-qanta Çomçe, çayxana 84 salan, konfeksiyona Şîrvân, pirtûkxana Dergah û konfeksiyona Güneş

29 Kanûn 1991: Bayiyê Tekel'ê Son Çarem û dîsa bayiyeke din ên Tekel'ê Tuncerler hatin bombekirin.

## LİSTIKÎN EŞKERE

Ev karxanê ku di vê demê de hatine bombekirin hin ji yên welatparêzan bûn û hin jê ji yên dîndarêna radikal bûn. Eşkere bû ku ev lîstik ji alî dewletê ve dihate lîstîn. Ji ber vê yekê welatparêzan dengê xwe zêde dernexistin. Digotin: "Divê em bi van lîstikan neyên xapandin." Lî belê TC ev lîstik ji zû ve amade kiribûn û iro wan bi destê hizb-i kontrayan didomîne.

## KUŞTINA ROJNAMEVANAN

Nûçegihanê kovara 2000'e Doğru Halit Gündgen û nûçegihanê kovara Yeni Ülke Cengiz Altun ev lîs-

tik roj bi roj derxistin holê û bi ser wan lîstikan ve çûn. Ji ber vê yekê ji her du nûçegihan jî, ji alî hizb-i kontrayan an ji bi navekî din ji alî "hêzen tarî" ve hatin kuştin. Gelê Kurd bersiva van kuştinan û lîstikan bi cenaza Cengiz nîşanî wan xwînxwaran da. Pişti vê bersivê demekê ev lîstik sekinîn. Dipay de hizb-i kontra dest avêt xwendevanan. Roj nema ku li xwendevanê welatparêz nexistin û birindar nekirin. Di vê demê de hizb-i kontra dest bi kuştinan ji kir. Çiqas mirovên welatparêz hatin kuştin, gelê Batmanê bê deng man. Ji ber vê yekê hovîtiyên hizb-i kontrayan zêdetir bûn. Edî ev xwînxwar, ji xwîna welatparêzan têr nedibûn û helwesta Batmaniya ji ew tor kirin.

## GIRİNGIYA HELWESTA GEL

Ev êrişen wan tenê ne li Batmanê; li Amedê, li Cizîrê, li Hezexê, li Farqînê li Nisêbinê û hwd. ji roj bi roj zêde dibûn. Lî belê welatparêzen van deveran ne wek welatparêzen Batmanê bûn. Hizb-i kontraya li ku destê xwe dirêjê welatparêzan kir, welatparêzen wan deveran desten wan şikandin, ew di-girtin û bi dest û lepan di-kuştin. Bi vi awayî hizb-i

kontra ji nav xwe avêtin. Dîsa li wan deveran milîsîni gel nedîhiştin hizb-i kontra çavê xwe veke, ji ber vê yekê hizb-i kontra ji xeynî Batmanê, li tu deverî nikare cih bigire.

## SERSARIYA BATMANIYAN

Li Batmanê hizb-i kontrayan çiqas mirovek kuştin xelkê Batmanê gavek paşve avêtin. Di vê demâ tarî û bi tirs de nûçegihan û nivîskarên rojnameya Özgür Gündemê Yahya Orhan, Hafîz Akdemir, Hüseyin Deniz û Apê Musa hatin kuştin. Burhan Karadeniz ji tê birîndarkirin. Nûnerê Batmanê yê kovara mehane Özgür Halk; Çetin Abayay ji di vê demê de hate kuştin. Li ber van bûyeran ji deng ji Batmanê derneket. Ev tirs li Batmanê ketiye dilê welatparêzan ji.

## "MIN DEŞİFRE NEKIN!"

Li Batmanê berê demekê bombe ji avêtin mala mirovekî ku welatparêz tê naskirin. Nûçegihanê kovar û rojnameyan diçin cem xwediyê malê û jê re dibêjin:

"Li ber vê bûyerê tu ci dibêji?" Bersiveke wisa dide ku mirov zimanê xwe gez dike. Ev kesê welatparêz dibêje: "Min deşifre nekin. Serê min nexin belayê." Li ber vê bersiva hanê hûn bin dê ci bibêjin? Hûnê nebêjin "Lawo ji xwe tu deşifre ne bûyana wan bombe nedîavêtin mala te."

Ev tîrsa ku li Batmanê roj bi roj zêdetir dibe, meydan ji hizb-i kontrayan re dihêle. Li Batmanê ku iro rojnamevan nikaribin baş bixebeitin û rojname ji neyên firotin, ji ber vê tîrsa rewşenbir û pêşverûyen vî helwesta welatparêzen û ji Batmanê ye. Ji ber vê helwesta Batmaniye ye ku di nîvê rojê de mirov di sûka Batmanê de têne kuştin, mirov bi erebeyen xwe re têne şewitandin, mirov li çayxanê nav hewçend mirov de bi çekan têne birîndarkirin. Ev bûyeren hanê li ku-derê welêt derketa holê, wê bersiveke wisa bidî-

ta ku careke din nebûya. Lî belê Batmaniyê welatparêz bi nav û deng xwe di mala xwe de vedişerîn. Dema ku dibe şev yek mirovek di xanbokê Batmanê de namînin. Batman dibe bajarekî mirî.

## "EV CI ŞERM E!"

Der heqê rewşa Batmanê de welatparêz Batmanî yê bê tirs rewşa Batmaniyan wiha anî ziman:

"Ev demeke kurt e xelkê Batmanê dibêjin ku bila gerîla me ji desten van hizb-i kontrayan xelas bike. Ev şermeke gelek mezin e. Xelkê Batmanê ji hawîrdora xwe şerm nake. Li Nisêbinê, li Hezexê, li Cizîrê û li hwd. xelkê, bi qehremanî li hember van şebekeyen cinayetê li ber xwe da û bi destê xwe bersiva wan da. Lî Batmanî, ne li ber xwe didin, ne piştigiriya hev dikin ne ji dengê xwe derdixin, lê, li hêviyê ne ku gerîla wan xelas bike. Ji bo xelasbûna xwe di mala xwe de rûniştine û li hêviya gerilayen in. Ji xwe şerm na-kin, nabêjin ji xwe gerîla li çiyayen welêt bi leşkerên dagirker, cerdevan û xayinan re şer dike. Şerê wî roj bi roj mezintir û girantir dibe. Ku şerme Batmaniyan hebûya wê di nav xwe de milîsîn xwe çêbikira û bersiva van êrişen hizb-i kontrayan bi-da... Lî belê heta niha Batmaniyan milîsîn xwe çenekirine, helwesteke rast derne-xistine hólê. Ü bi zimanê xwe Batmanê tev de rast di-kin û careke din ji, tunebûnê ava dikan. Lî belê ev tev go-tin in. Daxwaza me ev e ku xelkê Batmanê hişê xwe bide serê xwe û careke din vî bi-zanibe: Heta ku kumê tîrsê û bêrûmetiyê li serê wan be wê hovîti û êrişen hizb-i kontrayan ji dom bike.

Bila Batmanî vî ji xwe re bizanibin ku gerîla, Batman ji kontrayan paqî ji bike he-ta ev tîrs di dilê Batmaniyan de be wê hizb-i kontra ji careke din werin. Batman ji ber vê yekê di vê ku xelkê Batmanê van xwînxwaran xwe bi xwe ji nav xwe derxe... Ji bo vê ji divê pêşî tîrs a nava xwe bişkîne."

# Daxuyaniya nûçevanê ZDF'ê

Nûçevanê ZDF'ê Michael Enger û Yavuz Ferşoğu der mafê girtin û binçavkirina xwe de daxuyaniye belav kirin.

Ev herdu nûçevan, li başûrê Kurdistanê, li ser şerê di navbera PKK, Eniya Kurdistanî û dewleta Tirk de, agahdarî berhev kiribûn û hin ropor-tajan pêk anîbûn. Lî di dema derbasbûna Bakur de, ji alî hêzen dewletê ve hatibûn girtin û 3 rojan di binçav de mabûn. Rojnameyên Tirk, Michael Enger wek ajanê PKK'ê binav kiribûn û

nûçeyan bi vî rengî belav kiribûn.

Daxuyaniya nûçevanê ZDF'ê bi kurtî wiha ye:

"Di roja 2'ê Mijdarê 1992 an de, em nûçevan Yavuz Ferşoğu û Michael Enger, li Xabûrê, ji alî polîsîn Tirk ve hatin girtin. Me ji bo televizyona Alman ZDF'ê li başûrê Kurdistanê li ser rewşa şerê di navbera PKK, Eniya Kurdistanî û dewleta Tirk, agahdarî berhev kiribûn.

Me bi hemû alyîn şer re, roportajen pek anîbû. Lî di dema derbasbûna

me ya Tirkîye de, bi hin-cetên ne rast, ji alî hêzen dewletê ve hatin binçav-kin.

Dewleta Tirk, naxwaze raya giştî der mafê bû-yerên li Kurdistana Bakur û şerê Başûr de bi a-wayekî objektîf û rast bê agahdarkirin. Li gor dîti-na wan, her kesê ku li herêmê li hember kirinên wan derkeve an sempati-zanê PKK'ê ye an ji wek me ajanê PKK'ê ye. Di rewşa iro de, edî nûçevanen biyanî ji, nikarin xwe ji vê tewandariyê xelas bikin."

# PÊNÛS



Amed Tigris

## Dewleta bêpolîtîka bêleşker û bêal

**B**ereyê (Cepheyê) Kurdistanâ Başûr ji sala 1988'ı ve hatiye damezirandin, lê heta niha weke bereyekê tu karûbarekî siyasi nekiriye. Ne xwe weke sivil û ne ji weke leşkeri, xelk û hêzên xwe organize nekiriye. Tu dezgehek pêk neanîne. Ne kovar, ne radyo û ne ji TV. di vî warî de hewl nedaye. Herwiha navê bere li ser kaxez maye. Li gor dîtina min yek tiştîkî bereyê baş heye ku ew ji, bi damezirandina bere re qet nebe şerê navbera Yekîtiya Niştiman û Partiya Demokrat hat rawestandin.

Di roja 17'ê Gulana 1992 an de ji hilbijartina parlamento ya Başûr hat çekirin. Parlamento di bin ala Iraqê de vebû. Paşê bi ifsraza çend parlementeran ala Iraqê ji parlementoyê hat rakirin. Lê hezar mixabin heta iro ne li parlementoyê û ne ji li seranserê Kurdistanê ala Kurdi tune ye. Ji nav wê parlementoyê hikûmetek hat damezirandin. Wezaret hatin diyar kirin. Heta iro erk û wezifeyen parlamento û yên wezîran ne diyar in. Parlamento heye, wezîr hene, serokwezîr heye. Lê, disa wekî berê M.Berzanî û C.Telabanî li ser navê Kurdên Başûr diçin Amerika, Ewrûpa û Tirkîye, di seviya herî bilind de danûstandinê dîkin. Ji derî serokêni partiyen xwe herdu ji, tu wesfekî wan ên resmî tune. Ne serokê parlementoyê ne, ne serokwezîr in, ne serokkomar in. Vê evîndariyê hişt ku, dil û hinavê wî, bi ser ziman û toreya Kurdi ve bimîne bi hisret û şewat, ji ber bêxwedaniya gelê Kurdi û vê yekê pê re dûmkîn, ji biçûkahîya wî de û hişt ku bi zimanê Kurdi mijûl bibe.

Vê evîndariyê hişt ku, dil û hinavê wî, bi ser ziman û toreya Kurdi ve bimîne bi hisret û şewat, ji ber bêxwedaniya gelê Kurdi û vê yekê pê re dûmkîn, ji biçûkahîya wî de û hişt ku bi zimanê Kurdi mijûl bibe.

**Lê ne hewce ye ku Seddam scut bavêje an ji helikopter rabike, bi tenê piş bik, dê wek her car serok bi pêşmergeyên xwe ve ber xelkê xwe, li sinorê dagirkeran bigelibînin. Lê ji bo PKK'ê li ser sinorê xwe û Tirkîye bi alikarî û hevkariya Tirkîye 70 qereqol çedîkin. Sinorê ku dagirkeran di nav Kurdistanê de kişandine digirin garantiyê.**

in û ne ji wezîr in. Ev ci ya? Ev ci iradeya xelkê Başûr e? Yê seyr Mesûd û Celal bi Serokê MİT' a Tirkîye, Waliyê kolonyalistê Amîdê, bi serokê cendirmeyen Tirkîye re ji rüdînîn û bi wan re biryanan digirin. Yanî Berzanî û Telabanî di her warî û seviyeyî de temsila Kurdên Başûr dîkin. Ma wê vêca ev bere, parlamento, hikûmet, wezîr û pêşmerge ne?

Dewlet heye, al tune ye. Parlamento heye qanûn tune ne. Serokwezaret û wezaret hene, lê serokwezîr û wezîr tunene. Radyo û TV'ye partîyan hene lê yên dewletê tune ne. Pêşmergeyên Yekîtiya Niştiman û Partiya Demokrat hene lê pêşmerge an ji leşkeren dewletê tune ne. Di cündin û derketina Başûr de kontrola bacê (gumrikê) hene. Pêşmerge û kesen Partiya Demokrat û Yekîtiya Niştiman û Celal bi Serokê MİT' a Tirkîye, Waliyê kolonyalistê Amîdê, bi serokê cendirmeyen Tirkîye re ji rüdînîn û bi wan re biryanan digirin. Yanî Berzanî û Telabanî di her warî û seviyeyî de temsila Kurdên Başûr dîkin. Ma wê vêca ev bere, parlamento, hikûmet, wezîr û pêşmerge ne?

Dîsa ji gelek kesen meclîsparêz hene. Bi taybetî ew Kurdên Bakur ên ku her tiştîn xwe wîda kirine. Bajariyên xwe, réxistinîn xwe, hevalîn xwe. Heta malbatên xwe wîda kirine. Yanî ew bûne sêwîyen siyasi. Mirov nikare bîbêje sêwîyen siyasi. Ji ber ku sêwî yên ku dê û bavên xwe windakîrin e re te gotin. Lê ev kes, ne bi tenê dê, bav, bira, xwîşk, mam, pismam, xal, xwarza, xaltî û pîxaltiyên xwe, gundî û bajariyên xwe ji wîda kirine. Wisá bûye ku nikarin herin welat, ji ber ku yek silavê nade wan. Ji wan re nabîje: "Hûn bi xêr hatin." Kesen wiha bûne meclîsparêzên Kurdistanâ başûr. Ji serokêni Başûr bêhtir li diji PKK'ê ne. Li diji malbat gundi û bajariyên xwe ne. Li diji welatiyên xwe ne. Li ser navê meclîsî li gel Tirkan in. Ew kes û derdorêni wiha ji, ji bo parastina xwe meclîsî diparêzin.

Divê em Kurd vê meclîsî biparêzin, lê çawa û cîma? Berî her tiştî divê meclîsî Kurdistanî be? Danûstandinê xwe ji dewletê dagirker qut bikin. Danûstandinê xwe bi PKK'ê re geş bikin. Ew PKK û hemû hêz û kesen Kurd bibin yek. Herdu meclîsan bikin yek. Garantiya Medîsa Kurdan ev in, ne ku Tirkîye û welatên Rojava ne. Li her çar parçeyan ji niha fersendeyen mezîn ketine destêni Kurdan, divê bi baldarî gav bavêjin.

# Mîr Celadet Bedirxan û çîroka

## berhevkirina alfabeaya Kurdi - Latînî

### Konê Reş

Mîr Celadet Bedirxan, mîrê dûmahiya welatê Botan bû, neviyê Bedirxanê mezîn bû, ew Bedirxanê ku ji bo yekîtiya Kurdistanê xebitî û ji bo serxwêbûna wê, kete sek û pekîn girande, ter û hişkê xwe, di riya wê de wîda kir û ji bo wê li derveyî welatê xwe mir.

Mîr Celadet; kurê Emîn Ali Bedirxan paşa ye, bavê wî, ne tenê xwîna pak û rewân dayê, ew xwîna Kurdi, ku bi hezâr salan ve, di çiyayê Herekolê û zozanê Botan de, bi bayê kurr û reş re hînik dibû, gava di nav lat û zinarê "Birca Belek" de dikeliya. Lê dil, gurîk û hişkê malbata "Azîz" ji daye û bi wan hate xwedikirin.

Vêca nemir her dem û gav, hêşîrê hezkirina bav û bapîrên xwe bû û Kurd û Kurdistan, li ser zan û di bîra wî de bûn, hem ji evîniya gelê Kurdi û welatê Kurdistanê, di xwîna reh û damarên wî de cih girtibûn.

Di wê biçûkahîyê de, wî (13090)"1" gotinê zarê Kurdi, kom kirin, li Stenbolê. Lê ew gotin tev de hatin girtin û pêşkêşî dadgeha leşkeri û didît ku, alfabeaya Erebi dengnan dide xwendin. Lê ew deng nayîn nivîsin. Wiha wî ev kêmâyî xweşik nas kiribû.

Zimanzanê bilind Celadet Bedirxan; di derya zimanê Rojhilata Navîn û Rojavayê de, melevan bû û zimanzanê pirr bilind bû, bi van zimanân diaxivî û dînîvisand: Erebi, Farîsi, Fransi, Yewnanî, Tirkî, Almanî, Ingilizî û Rûsi.

Belê ji bavê xwe Emîn Ali, ew bavê halxwes, zane û Kurperwer û jêhatî, nemaze di niştimanperwerî de, ew jê hîni gelek tiştîn welatperwerî bûye û hem ji, ji wan kesen ku li dor bavê wî kom dibûn û doza Kurdistanê dikirin çavên wî vebûn, dinya dît û serwextî çanda gelek miletan bû. Vêca rabû, zanîna xwe tev de raxist. Ji bo berhevkirina alfabeaya Kurdi - Latînî bi kar anî.

Lê ji bo eşkerekirina kar û xebata nemir Celadet Bedirxan di vî warî de, angò berhevkirina alfabeaya Kurdi - Latînî, divê em bidin zanîn ku nemir "Hawar" ji bo nivîsandina zimanê Kurdi weşand û himê alfabeaya Kurdi - Latînî di nav rûpelân wê de belav kirin, di her "15"ê jîmarê pêş de, ji "15"ê Gulana 1932 an, heta 27'ê Adara 1933 hejmara 18 an... Wiha alfabeaya wî ma bingehê nivîsandinê ji Kurdan re.

Celadet xuya ye, ku gelek asteng û dijwari dîtîne, gelek salan xebitiye, heta ku alfabeaya xwe berhevkirina, ji Kurdan tevan re, ci Kurmanç, ci Sorî, ci Lorî...

Ü hem ji zîrekiya Zendî xuya ye, di nameya ku ji Mistefa Kemal Paşa re nivîsbû, di sala 1933 an de ku Zendî zimanzanê pirr bilind bû û gelekî mijûl bûbû di zimanê rojhilatê, nemaze dema ku xwendina xwe li bajarê Elmanî û "Miyûnix (Münîx)" diqedand, hingê wî ferhengok di zimanê mîletan de "Etimologîe" dixwend û berhevkirina alfabeaya Kurdi dikin. "2".

Pîştî "sêzdeh" salan ji xebat û mijûlbûne bi zimanê Kurdi re wî dengen zimanê Kurdi yêngîn bingehîn "Sîh û yek" tip tenê dîtîne, ji her "sê" zarêni Kurdi re, ew dibêje:

"Sehetiya ko di her sê zarêni Kurdi de hatine çekirin, xuya kirine ko di zimanê Kurdi de dengen bingehî ev sîh û yek in..." "3"

Zendî her sîh û yek tip di kovara "Hawar" û de belavkirine û yek bi yek ji xwendevan re dane nasîkirin, hem ji bi firehî li ser bingehîn wan tipan se-

HAWAR

Qomela Qurdî \* Revue Kurde

Armanç, Awayê Xebat û Nivîsandina Haware

Logoya kovara Hawar

kiniye û xweseriya her dengê ji xwendevan re da-ye zanîn û bi hin zimanê biyani re berhevkirina û çîma tip wîlo hatine bijartîn ji xwendevan re bi nîşan û zelal kiriye û li hemberî her dengê Kurdi tipêk û her tipêk dengê daniye. Vê yekê hiştîye ku xwendin û nivîsandin bi alfabeaya wî geleki hêsan be, ew tip ev in:

A B C Ç D E È F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Ü V W X Y Z

Belê ev tip du texlit in:

1. Dengdêr
2. Dengdar

1. Dengdêr: Tipa ku dengê wê bi serê (tenê) xwe derdikeve û dengdarban bi xwe re derdixîne, di zimanê Kurdi de, "Heş" dengdêr hene belav di- bin du par:

A. Dengdêrên kin (kurt): Jimara wan sisê ne: weke . شر

E- Şer: weke "Feth" di zimanê Erebi de  
I- Kir: weke "Kesre" di zimanê Erebi de  
U- Kul: weke "Deme" di zimanê Erebi de

B. Dengdêrên dirêj: jimara wan pênc in:  
A- Av: weke "elîf" dirêj e di zimanê Erebi de

Ê- Dêr: weke gotina "دیر- صبر" ya Erebi cih digire.  
Z- Zîv: weke "زیو" ya Erebi ye.  
U- Kûr: weke "û wa" Erebi ye.

O- Sor: weke "O" Fransi dirêj e.

2. Dengdar: Tipa ku dengê wê, bi serê xwe, bê alîkariya dengdêrân dernakeve û deng nade, jimara wan "bîst û sisê ne", ji wan bîst û sê dengdarban "Hivdeh" tip di alfabeaya her zimanê Latînî de he-ne, ew "Hivdeh" ev in:

B D G H K L M N P R S T F V W Y Z

Nemir ev "Hivdeh" tip di alfabeaya Kurdi de hilanîne û neguhertine, ji ber ku dengen zimanê Kurdi bi wan li ser kaxezê bi cih dibûn û hem ji, ji bo Kurd hîni alfabe û zimanê biyaniyan bibin û biyanî hîni û Kurdî bibin bi hêsanî bê dijwari.

Lê her "şes" dengdarban din yên mayî weke:  
Q J Ş C X

Nemir ev her şes bijartîne û bi gelek zimanên din re berhevkirine weke:

Q- Weke dengê "ق" (qaf) a Erebi tê lêvkîrin, belê jê nermitir û sıviktir e.

J- Weke dengê ku Fransızî "J" ya xwe bi lêv di-kin, deng dide.

S- Weke dengê ku Ingilizî "sh" ya xwe bi lêv dîkin hem ji weke "sch" ya Elmanî û weke "ش" ya Ereban deng dide.

C- Weke dengê ku "ج" (cîm) ya Erebi tê lêvkîrin û deng dide.

Ç- Weke dengê ku "چ" (çîm) di Erebi de tê nîşankirin û weke dengê "z" ya Elmanî...

X- Weke dengê ku di alfabeaya Yewnanî û Erebi de bi "x" û "چ" (xê) tê lêvkîrin û dengdan.

Wê bidome

Xwendevan li Kurdî xwedî dernakevin. Pirtûkên bi Kurdî nayê firotin - 2

# Ji 20 milyon Kurd re 40-50 hezar pirtûk

## nûbihar

Weşanxaneya Nûbihar: Di 1992 an de tê damezirandin. 4 pirtûk derxistine. 2 ji van bi Kurdî ne. 2 jî li ber çapê ne. 5000 têçapkirin, ji van nêziki 3000'î têçapkirin. Pirtûka bi navê Risala Biratiyê (2 cild) 4000 firotiye. Di pêşerojê de wê bi pirranî li ser weşandina bi Kurdî bisekinin.

- Rîsala Biratiyê  
- Peyvîn Piçûk

- Peyva Bîst û Sêyemîn: Seidê Nûrsî, Rîsala Tebiêtê û Rîsala Ixlasî li ber çapê ne.

Weşanxaneya Med: Heta niha 6 pirtûk derxistine û tev jî der heqê Kurdan dene. 2 heb tenê bi Kurdî hatine nivîsin.

Wê êdi zehf li ser weşanen bi Kurdî bisekinin, ji bo pêşxitina ziman wê di vî warî de bixebeitin.

- Salar û Mîda: Cegerxwîn  
- Gramera Kurdî: Cemal Badîh



Tirkî hatine nivîsin. Pirtûkên wan ên xwerû bi Kurdî nîn in. 3000-5000 têçapkirin û hemû hatine firotin. Pirtûka wan 'Apo ile Görüşmeler' (Doğu Perinçek) 20.000 hatiye firotin. Wê pirtûkên xwe bi Kurdî û Tirkî tevî hev biweşînin. Pirtûkên wan ên bi Kurdî û bi Tirkî ev in: -Gotinê Pêşiyen Kurdan; Huseyîn Deniz  
-Dersim (Zazaca) Atasözleri; Mesut Özcan  
-Lenin Şafağı; Cegerxwîn

Weşanxaneya Komal: Di 1974 an de dameziriye. Heta niha 45 pirtûk derxistine û giş der heqê Kurdan de ne. 2 heb ji van xwerû bi Kurdî ne. Tev di warê edebî de hatine nivîsin, Qolinç: Torî, Jana Gel: İbrahim Ehmed. Pirtûka bi navê "Xezal" jî li ber çapê ye. 2000-3000 çap dibin, lê nêziki 400 i têçapkirin. Di pêşerojê de wê zêdetir li ser zimanê Kurdî bisekinin.

Navenda Çanda Mezopotamya: 1991 an de dameziriye. Heta



Weşanxane û xwendevan Kurdî li xwe qedexe dikin. Weşanxane ji ber ku zêde nayê firotin pirtûkan çap nakin; xwendevan jî bi Kurdî naxwinin.



pirtûk weşandine û herdu jî bi Kurdî ne.

- Hebü Tunebü, Prof. Celilê Celil: Çirok



Kurdan de ne. Tev 3000 çap bûne û hatine firotin. Hemû bi Tirkî hatine nivîsin. Di programa wan de êdi weşanen li ser Kurdan wê nîn bin. Êdi ev kar spartine ser weşanxaneyen Kurdan.

Weşanxaneya Yurt: Di 1978 an de hatiye damezirandin. 83 pirtûk derxistine. Tev bi Tirkî ne. Weşandina wan a bi Kurdî wê qet nîn be. Naxwazin bi Kurdî pirtûkan biweşînin, ji ber ku di nav Kurdan de xwendin û nivîsandina bi Kurdî kêm e. Ü dixwazin weşanxaneyen Kurdan vî karî bikin. 30 pirtûkên wan der heqê Kurdan de hene. Ji van 22 heb ên Ismail Beşikçi ne.

Weşanxaneya Melsa: Di sala

**MELSA YAYINLARI**

niha 34 pirtûk derxistine. Tev der heqê Kurdan de ne. Ji van pirtûkan 4 heb bi Kurdî hatine nivîsin.

Pirtûkên xwe yên helbestan 1500-2000 heb diweşînin. Ên din di navbera 4000-5000 hebî de çap dikin. Her çiqas bê komkirin ji tev têçapkirin.

Pirtûkên Abdullah Öcalan, 10.000 heb çap dibin û tev jî têçapkirin.

Pirtûkên wan ên bi Kurdî ev in:

Hewisîna Pêşeriya Zimanê Kurdi, Feqe Huseyn Sağnîç, (1-2)

- Evîna Welat: Abrurrahman Dürre, Helbest

- Kela Dimdimê: Jan Dost, Destan

Ferhenga Huseyîn Deniz a Kurdi û Tirkî li ber çapê ye.

Di programa wan de çapkirina pirtûkên bi Tirkî jî û bi Kurdi ji hene.

weşanxaneya Fîratê der barê çapkirina pirtûkên bi Kurdî de wiha dibêje: "Herciqas pirtûkên bi Kurdî zêde neyê firotin jî em dê çapkirina pirtûkên bi Kurdi di pêşerojê de jî bidomînin."

Pirtûkên weşanxaneya Fîratê yên bi Kurdî ev in:

1) Memlûd: Mela Ehmedê Batê

2) Nûbar: Ehmedê Xani (Ferhenga bi Kurdî û Erebî ye)

3) Evîna Cemîlê: Cengiz Aytmato-Roman

Ên li ber çapê jî;

- Dîwan; Melayê Cizîri

- Berbang; Erebê Şemo

- Berhevoka Çirokê Kurmançî: M.Alexandre Jaba

- Gundikê Dîno: Cankurd

Weşanxaneya Pelê Sor: Di sala 1991 an de dameziriye, lê di 1992 an de dest bi weşanen pirtûkan kiriye.

Heta niha 10 pirtûk derxistine, 8 heb ji van der heqê Kurdan de ne. Pirtûkên bi tenê xwerû bi Kurdî hatiye weşandin. Ên din an bi Tirkî ne an jî nîvî bi Kurdî û nîvî bi Tirkî ne. Pirtûkên xwe nêziki 3000 i çap dikin. Ji van ên ku bi Tirkî û Kurdî têçapkirin ên heri zehf têçapkirin in.

Weşanxaneya Pelê Sor ji ali aaboriyê ve iro di tengasiyekê de ye, lê ku karibe di pêşerojê de wê çapkirina pirtûkên bi Kurdî bidomîne. Pirtûka Pelê Sor ya bi Kurdî hatiye çapkirin ev e:

Antolojiya Helbesten Kurd; A.Balî nivîsiye.

En li ber çapê jî; Doza F.Nan: Adil Zozanî (Kurteçirok)

- Evînê û Jiyan; Lokman Pilot (Kurteçirok)

- Gotinê Pêşiyen Kurdan (Kurt Atasözleri); A.Balî. Wê ev pirtûk bi Kurdî û Tirkî be.

Weşanxaneyen ku der heqê Kurdan de ci bi Tirkî ci bi Kurdî weşanan dikin ev in: Akyüz, Arkadaş, Belge, Broy, Beybûn, Berhem, Boyut, Berfin, Benek, Cem, Doz, Deng, Dönem, Fîrat, Fîrat Dicle, Gökyüzü, Hassat, Kaynak, Koral, Komal, Kendi, Medya Güneşî, Med, Melsa, Milliyet, Öz-Ge, Öteki, Pelê Sor, Sosyal, Sel, Sun, Varyos, Yurt, Yön, weşanxaneya Yorum û Weşanen Turkish Daily News.

Ev lêkolîna me ya ku li ser weşanxane û berhemên bi Kurdî ne, du hefteye ku derdekeve. Lê ev lêkolîn li dû xwe gelek pirsên girîng di serîyan de hiştin. Bi kurtî encama giştî ya li ser lêkolînen weşanxaneyen Kurdî ev in.

Li Tirkîyê heta iro bi tevahî 36 weşanxane der heqê Kurdan de 454 pirtûk weşandine. Ji vanan 15 weşanxane tenê bi Kurdî jî berheman çap kirine. Hinek pirtûkên ku derketine nîvî bi Kurdî û nîvî bi Tirkî ne. Ji 454 pirtûkên ku van weşanxaneyen derxistine, 36 ê wan tenê xwerû bi Kurdî ne. Ev jî %9 e. Ev hejmar bi rastî jî, ji bo nêziki 20 milyon Kurdîn ku li bakurê Kurdistanê dijîn re gelek hindik e. Pirtûkên bi Kurdî di navbera 2000 û 3000 i de têçapkirin.

Lê li der dora 300-700 hebî têçapkirin. Li aliyê din hin awarte (îstisna) jî hene. Wek, pirtûka Cegerxwîn ya bi navê Lenin Şafağı (Berbanga Lenin) ku ji ali weşanxaneya Kaynak ve bi Tirkî û Kurdî hatiye weşandin, 5000 heb firotiye. Ev lêkolîna me rasîtiyekê din jî da nîsan ku berhemên bi Kurdî û Tirkî li gorî yên xwerû bi Kurdî zêdetir têçapkirin.


Ji ber kêm xwendina bi Kurdî, weşanxaneyen ku bi Kurdî berheman çap dikin dibe ku di pêşerojê de dev ji weşanen bi Kurdî berdin. Divê ku weşanxaneyen Kurdan qonaxa ku niha em tê de dijîn baş binirxîn, ji xwe jî vê rewse bipirsin û berpirsiyariya ku hilgirtine ser milen xwe pêk bînin. Li weşanen bi Kurdî tenê bi çavên ba-zirganiyê nenihîrin.

Bi rastî jî tiştî de dawiyê de xuya dike ev e. Heta ku rêsistîna zimanê Kurdî ya hevgirti û saziyên perwerdehiya zimanê Kurdî çenebin, nîvîsandin û xwendina bi zimanê Kurdî zêde bi pêş ve naçe û wê ev rewse herwiha bidome.

# Di bîranînên Çağlayangil'de îdama

## Seyîd Riza

*Serokê serhildana Dêrsimê Seyîd Riza, di 18'ê Mijdara 1937 an de, ji alî, hêzên dagirker ve hatibû dardekirin. Em vî serokê mezin di salvegera dardekirina wî de, ji pênuşa burokratekî Tirk, İhsan Sabri Çağlayangil, bi bir tînin. Ev cara yekemîn e ku berpirsiyarekî dewletê, di bîranînê xwe de, dardekirina Seyîd Riza û hevalên wî li gor dîtinên xwe, lê nêzî rastiyê tîne ziman. Em vê bîranîna İhsan Sabri Çağlayangil, ji ber balkêsiya wê, bê guherandin jî xwendevanên xwe re werdigerînin û diweşînin.*



Bîranînên Çağlayangil

"SAL 1937"

Sükrü Sönmensuer, ji dema Atatürk, Midurê Emniyetê yê Giştî û bi nav û deng e.

Rojek gazî min kir û got: "Dê Atatürk, ji bo vekirina Pira Singeçê here Diyarbekir"

Seyîd Riza, di wê demê de, Serokê Dêrsimê ye. Ji sulala pêxember e û wesfekî wî yê dînî jî heye.

Cemê Feradê, li hêla Pira Şeytanê, heta 4 mîtroyan teng dibe. Kûrahiya wê jî mîna deryayan dibe 17 mîtro. Li vir pirek çêkirine. Li ser pirê jî qereqolek. Li qereqolê jî 33 leşker û li serê leşkeran ji teymenekî neesîl heye.

Dêrsimî, êrişek dabin serpirê. Di vê êrişê de, qereqol tê şewitandin û 33 leşkeren me şehîd dabin.

Ev bûyer, destpêka serhildana Dêrsimê ye.

Atatürk, bi vê meseleyê re têkildar dibe û ferman dide peywirdaran: "Vê meseleyê ji binî" ve hal bikin."

Di wê demê de li Mazra (Elczîz) yê Mufetîşê Imûm-i Hüseyin Abdullah Akdoğan Paşa heye.

Ez ji Miduriyeta Emniyeta Melatê, tayînê Enquerê bûme.

Walî Ibrahim Etem Akinci mirovîkî çetevan û şovalye ye. Di dema şerê rizgarbûnê de, bi Demirci Efe re çeteyek daniye. Walî ji wekaletê re, şifreyek bi rê kiriye. "Midurê Emniyetê, tayînê Enquerê bû. Em ji bo dîtina tevgera Dêrsimê, dixwazin herine Mazrayê." Di wî demê de, der mafê vê serhildanê de rîwayetên cur be cur hene.

Em dirêj nekin. Ez û walî bi destûra Enquerê gihiştin Mazrayê. Dibin mîvanê Mufetîşê Imûm-i Abdulla Paşa. Xwesteka xwe jê re dibêjin ku em dixwazin lêgerîna serhildana Dêrsimê bikin. Dibêjê: "Baş e ku hûn hatin, ezê ji sibê herim wê herêmê. Min berî bi 15 rojan bi navgîniya wergêrek, bi wan asîyan re xebîr da. Min ji wan re got, ger hûn serokên eşîrên xwe teslimî me bikin, emê vê operasyonê rawestinîn û aşitî çêbîkin. Sibê, roja dawî ye. Herêma ku emê biçinê, hinck bi talûke ye. Wê çi bibe, ne diyar e. Ger dixwazin, hûn jî werin."

Me xwarin xwar, xwarineke germ û bi rûnê zeytûnê. Ez hînbûyi nîn bûm. Nexweş ketim. Agirê min bûye 38. Lî naxwazim ji bûyerê jî bîmînim. Wilo nexwêş, em ber bi hêla operasyonê ve bi rê ketin.

### BI ASIYAN RE RÛ BI RÛ

Li pêş û paş me du qamyon. Em di navê de ne. Di qamyonêkî de, leşker hene. Di ya din de, nanêni ji tendûrê derketi, hê ji germ in. Rê, bi dewriyan dagirtî ne. Dewriye di mewziyan de. Di vê navê de, dewriye bi xeletî li me agir reşandin. Dû re dema wan em nas kirin, sekinin.

Em hatin cihê xwe. Ji cihekî bilind dakin xwarê. Cihê

ku em dakinetê, leşker lê bi rîz bûn. Abdurrahman Paşa amadekariyên pêşgirtina kemînan kiribû. Li cem min makîneyeke fotografan heye.

Em hinek rawestiyan. Li wan deran tu kes nîn e. Me qérîn kir, gazi kir, wergêrek hate rastê.

Abdullah Paşa:

- Hûn hatin?  
- Belê,

Çend mirovîn lewend, ên bejindirêj, sîng û ber vekirî derketin holê. Abdullah Paşa, bi telisan nan li wan belav kir. Birçî bûn. Nan hûr kirin û dest bi xwarinê kirin. È mayî jî kirin paşila xwe.

Paşa ji wan pirsî:

- Hûnê wan ûn di listeyê de, nîvîsandîne bînin?  
- Ji bili 3 kesan, emê 12 kesan bînin.

Abdullah Paşa gote wan: "Nabe". Wan jî, bi biryardarıyeke xurt bersiv da:

- Em çi bikin paş, ku na-be bila qet nebe.

Asî li çiyan star bûne. Yekî bi mawzer, dikare alayıyek bisekinîne. Paşa hinek sert: "Hûn nikarin bi dewletê re serî derkevin. Çima hûn wan teslim nakin?"

Ji nav wan ê herî dirêj, derkete pêş:

- Ji bo jînekê tenê mîrek divê. Hûn niha hikûmet in. Leşkeren we hene. Hûn iro li vê ne. Emê wan bidin we, hûnê wan bibin herin û emê ji nû ve di destê wan de bîmînin. Dawî wê ev axa û beg xweliya me daxin. Hûn rîkarin bikevin Dêrsimê. Nikarin cendirmeyen xwe têxine bajêr.

Abdullah Paşa rawestiyan, poniji, pişt re ji wergêr re wi-ha got:

Ez ji Kastamonuyê me. Hûn dîroka Kastamonu û dîzannî. Ji nav bajêr çemek diherike. Der û dor bi yekcarî

### İHSAN SABRI ÇAĞLAYANGİL KÎ YE?

İhsan Sabri Çağlayangil, burokratekî Tirk e. Di dema Atatürk de, 15 salan di Miduriya Emniyetê ya Giştî de, di berpirsiyarekî cure cure de kar kiriye. Dû re 15 salan Walî, 9 salan Senatori û 10 salan jî Wezîriya Karêne Derve kiriye.

Di dîrok û siyaseta Komara Tirk de, cihekî wî yê cihê heye.

İhsan Sabri Çağlayangil, bi emrê Atatürk, di dardekirina Seyîd Riza û hevalên wî de, amade dibe. Bîranînên xwe jî, li ser vê çarçoveyê nîvîsiye.



Meletê-1937

wek çiyan bilind dibin. Di demekî de, li aliyeke Kastî, li alyîe din jî Tumanî hebûne. Wan bajêr ava kirine. Ev peydi nav demê de guheriye û bûye Kastamonu. Ez ji alî Tumanê me. Tuman jî niha bûye Demenan. Eşireta we jî Demenana iro ye. Hûn mirovî min in. Bapirêne me li cihekî digihîjin hev.

Wilo mekin. Ez 15 rojîn

din jî bidim we. Herin û heta 15 rojan van mirovîn di listeyê de werînin.

Di wê listeyê de navê Seyîd Riza jî heye. Ü di nav wan 3 kesen ku naxwazin teslim bikin de ye. Di vê navê de min fotograf dikişandin.

Em vegeleyan.

Rêveberiya şer, di bin qu-mandariya "Kurmây Albay Neşet Bey" de ye. Dema ez bûm Waliyê Çanakkaleye, min ev mirov li wir wek Serokê Garnizonâ Leşkeri dît.

Piştî em ji axaftina bi asîyan re vegeleyan, Neşet Albay ji me re wiha got: "Ev tişt hemû, ji bin serê Seyîd Riza derkevin. Seyîd Riza ji sulaleya Pêxember nîn e. Di za-roktiya xwe de, nexweşînêkî derbas dike. Jî malbata wî re dibêjin: "Sebiyê tevî qûndaxa wî bibine dîrê, li wir bîhelin û serê sibê herin bînin wê sax bibe." Wan jî wilo kiriye. Serê sibê çûne û sebî anîne. Lî li gor rîwiyetek, zarok bi hev guherîne. Neşet Albay jî idîa dike ku Seyîd Riza ji sulaleya Pêxember nîn e.

Ew Seyîd Riza mezin bûye. Pira Şeytanê şewitandiye. Bûye Serokê dîni. Niha serokatiya Dêrsimîyan dike û serhildanê bi rê ve dibe.

Çend meh bi ser de çûn.

Ez vegeleyam Enquerê. Èw 15 roj wextê ku dabûn wan jî xelas bûbû û wan ên di listeyê de teslim nekiribûn.

Çend mehîn din jî derbas bûn. Seyîd Riza û hevalên wî hatin girtin, mehkemekirina wan didome. Di wan rojan de ye ku, dê Atatürk biçe Diyarbekir û pira Singeçê ku li ser çemê Mûradê ye veke. Dê pêşî biçe Mazrayê û bi crebeyê derbasî pira Singeçê bi-be.

Serokê Emniyetê yê Giştî Sükrü Sönmensuer ji min re dibêje: "Dê Atatürk biçe pira Singeçê veke

Dawî li tevgera Dêrsimê hat. Ji Rojava 6 hezar kesen derpêspî Mazrayê dagirtine. Wê ji Atatürk cfükirina Seyîd Riza bixwazin. Em nehîlin ku ev derpê spî derkevin pêşıya Atatürk."

Di sala 1973 an de, roja ta-tîla fermî, piştî nîvro ye. Wê Atatürk roja duşemê were Mazrayê. Ji me tê xwestin ku yên dê werin dardekirin, bila rojek zûtir darde bibin. Da ku dema derpêspî derketin pêşıya Atatürk, bila her tişxelas bûbe.

Di wê demê de, Waliyê Mazrayê Şefik Beg e, Hatemi Senîhi Beg dozger, Serezî Ibrahim Beg Midurê Emniyetê, alîkarê dozger jî hevalê min e.

Sükrü Sönmensuer ji min re got: "Ji liqê siyasi ya Miduriya Emniyeta Giştî, tiştîn ku sivil dixwazin bistîne. Parastîna Atatürk ji rawestîngchê he-ta "halkevi" jî karê we ye." Tevi Macar Mustafa min, 6 kesan hilda û bi rê ketim. Bi trêne gihiştim Mazra ye.

Wê bidome

# Bertolt Brecht û tiyatroya epîk

Murat Ergin

Di sala 1992 an de li Munihê şanoyek tê şanogehkirin (tê schnegherin). Di kûlisa şanogehê de ji siwanen texte yêndu metre diwarki ava bûye. Rismen li ser diwar, mîna ku ji ali zarokan ve hatibe çekirin, bûn. Hiveke sor ji kaxez e û dengê qerebalixê ji nizim didin guhdaran. Gaveke din marşla Marseillaise bi gramafonê tê lêxistin. Li salona ku temaşevan lêhene, panoyeke ku li ser ev hevok hatiye nivisin, tê daleqandin. "Herkes di nav çermê xwe de baş e. An ji ewqas romantik lê nenihêrin."

Ev listika bi navê "Dengê Trampetê di Şevê de" ku me li jorê jê beşek nivisand, di tiyatroya epik ya Brecht de gava pêşî bû. Brecht ramanen xwe yêngiştî belki ji di vê listikê de da û ji temaşevanan re ev got: "Ev tiyatroya, tiyatroya ku em zanîn e; ev texte ne, ev ji hiveke ji kaxez e. Wisa romantik romantik nenihêrin."

Xwediyê van gotinan, şair, sazumankarê tiyatroya epik û ramyarê mezin Bertold Brecht, di sala 1884 an de li Almanya li bajarê Augsburg hatiye dinê. Brecht zarokeki malbateke dewlemend bû. Heta lisayê qedand li vi bajari ma. Di sala 1912 an de, ji bo dibistana tibbê bixwine cû Munihê. Di sala 1918 an de ji çû leşkeriyê. Pişti ku li Nêxweşxaneyê Leşkeriya Augsburgê çav bi birindarêne herbê ket, di mejîyê wi de heta mirinê, fîr û dîtinên li dijî herbê afirin. Tesira vê rewşa wî xwe di helbestenê wî, de ji dide xuyakirin.

"Tişte ku li diwar hat nivisin/ "Em şer dixwazin"/ Pêşî hat kuştin/ È ku nivisi."

Brecht listika xwe ya yekemin ya bi navê "BAAL" di vê demê de nivisi. Di vê demê de, ji xeynî perwerderiya tibbê, têkiliyên wî bi pirrani bi nivîskar û şanogeran re hebû. Di 1922 an de bi listika xwe ya "Dengê Trampetê di şevê de" û şanogehkirina vê listikê bû xwedî şohretekî mezin. Ji vê salê û pê ve, berhemên wî yêndi warê tiyatroya epik de çebûn û hatin şanogehkirin. Di 1923 an de "Eduardê Yekemin", 1924 an de "Li Devîya Bajaran de", 1926 an de "Zilam Zilam e", 1928 an de "Operaya Bi Sê Qurûşan" nivisi. Di 1930 yan de bi listika "Bilindbûn û daketina bajarê Mahagonny" di warê tiyatroya epik de derbasi merhaleya heri bilind bû.

Tiyatroya epik ya Brecht di tiyatroya Çinê, di tiyatroya şoresser ya Georg Büchner û di ditina tiyatroya politiki ya Piscator re derbas bûye û afiriye. Brecht vê cûreya listikê re dibêje listika ne ji ya Aristotelesker. Li gorî Brecht di tiyatroya epik de tiyatroya li şûna ku bûyer bê listin, divê bûyer ji guhdaran re bê gotin. Li şûna ku temaşevan di pêvajoya listikê de ji xwe derbas bibin, divê wek



Bertolt Brecht, 1928

çavdîran (gözlemci) temaş bikin û di dawiyê de bibin xwedî biryarekê. Bi vê yekê ji armanc aktifkirina temaşevanen ku di listikê dramatik de dibin pasif e. Weke tê zanîn di tiyatroya dramatik de insan hebûnek e ku ji her aliye ve tê naskirin û nayê bawerkirin ku wê biguhere. Lê tiyatroya epik insan dike mijara (mevzû) lêkolînê. Ü nişan dide ku insan kare biguhere. Di şıklê nû ya ku tiyatroya epik anîye de elemanê heri giring, elemana biyanikirin e (xeribkirin). Bi vê şıkla biyanikirinê Brecht dixwaze tişte ku té listin ji ali temaşevanan ve hem bê naskirin û hem ji, ji wan re xerib bê. Bi vî awayî ji dike ku temaşevan bûyera listikê xwezayî nebînin; rexne bikin û bipirsin.

Brecht vê şıkla biyanikirinê di sê qadan de bikar tîne.

1) Di saziya manzûmeya (metin) listikê

2) Di raxistina sahneyê.

3) Ú di listikgerê de.

Sahneyên ku listikvan berê xwe didin temaşevanan û dilizin, an ji stranen li ber muzikê têngotin û di nav axaftinan de têngotin ji, tev elemanen biyanibûyinê ne.

Brecht pişti sala 1936 an cû Amerikayê, li wir ji listikên xwe dan şanogehkirin. Lé li Amerikayê listikên wi ewqas eleqe nedîtin. Pişti sala 1947 an derbasi Moskôv bû. Bi hinek ronakbiran re rojnameyek derxistin. Lé li Moskôv ji pirr nema, sê çar sal şûn ve derbasi Berlinê bû û heta

mir li wir ma. (1956)

Brecht ji xeyni xebatên di warê tiyatroye de, di warê ramyariya estetikê û di warê helbestan de ji xwedî berhemên giring e. Weke listikên wi yêngiştî, helbestenê wî ji di bin tesira sembolistan de bû. Pişti ku marxîzmêna: kir, helbesten hêsan, herikin û vekirî nivisin. Ü xwe ji dîtinên helbesten Rimbaud û Baudelaire veqetand. Brecht şıklê biyanibûyinê di helbesten xwe de ji bi kar anî. Helbesten Bertold Brecht sivik, vekirî û herikin in. Helbesten ku herkes dikare jê fêm bike. Lé, li aliye din ev helbest gelek sift (yoğun), tiji û helbesten ku ji eqil natîrsin in. Helbesten wî helbesten ku bi eqil û bi hisş ve dimeşin in. Bertolt Brecht gava di sala 1956 an de mir li pişt xwe tiyatroyeke epik a ku dinya hejand, helbesten delal û ramyariyên estetikê ji me re hiş.

Berhemên Brecht:

Yêngiştî: Baal (1922), Dengê Trampetê di Şevê de, Çekîn Dayîka Carrar, Galilei, Leşkerê Şer Svayk û Operaya Bi Pênc Qurûşan.

Berhemên ramyari:

Li Ser Tiyatroya Epik, Realizma Civaki û Civak

Çavkanî: Ansiklopediya Britanica, Bertold Brecht Epik Tiyatro (Weşanxaneyê Cem), Brecht Marlanne Kesting.

# AZADÎ



Abdurrahman Durre

## Dîn û miliyet

înê islamê, heqê hemû xelk û gelan, wek hev nas dike û diparêze. Di dînê islamê de, hemû gelên dînyayê wek hev in, reng, ziman û çanda wan, belgeyên mezinahiya Xwedê ne û inkariya wan, inkariya ayetên Xwedê ne.

Di pirr ayetên Quranê û hedîsên pêxember de, ev rastî hatiye eşkerekirin. Di dînê islamê de, heqê eqrebatî û cinariyê ji pirr giring e. Zilm û alîkariya zilmê ji, pirr pîs û xerab e. Nîjadperestî (irkçılık) zilm e, cirm û gunehekî pirr mezin e. Belê miliyet û gelperwerî heq û heqîqet e. Ji ber vê, dînê islamê nîjadperestiyê red dike, miliyet û gelperwerî heq qebûl dike, rast dizane.

**Di dînê islamê de, heqê eqrebatî û cinariyê ji pirr giring e. Zilm û alîkariya zilmê ji, pirr pîs û xerab e. Nîjadperestî (irkçılık) zilm e, cirm û gunehekî pirr mezin e. Belê miliyet û gelperwerî heq û heqîqet e. Ji ber vê, dînê islamê nîjadperestiyê red dike, miliyet û gelperwerî heq qebûl dike, rast dizane.**

mirovê xwe yêng zâlim bike".

Di hedîsek din de ji gotiye: "Hûn ci ji xwe re dixwazin, heta ku ew ji hevalên xwe re ji nexwazin, îmana we qebûl nabe, hûn nabin muslimanên rast."

Li ser vê, divê ev rastî rind bê fêmkirin û eşkerekirin ku iro, ev hikûmetên ji xwe re dibêjin musliman û heqên Kurdan ên insanî paymal dikin, welatê wan, zimanê wan, folklorâ wan, çanda wan talan dikin, li hember azadî û serxwebûna wan dertên, dicivin û planan dikin, hern ne musliman in, hem ji zalim û virek in. Ew kesen ku doza muslimanîye dikin û wek wan hikûmetan difikirin û wan destek dikin, ew ji nemusulman in, minafîq û sextekar in, virek û neyar in.

Divê, tu kesê Kurd, bi van dev muslimanên dilgawir nexapin, ji wan re bêjin ku; hûn bi rastî ne musliman in, hûn nîjadperest û zalim in, alîkariya zalimên xwe dikin. Gelê Kurd mafêñ hemû gelan qebûl dike (Zimanê wan, kultura wan, azadiya wan û hwd.), ger hûn bi rastî musliman in, divê hûn ji, van hemû heqan ji Kurdan re nas bikin, bixwazin, berbirêñ hikûmeten xwe derkevin û ji wan re bêjin: "Kurd ji ïnsan in, musliman in, divê em heqên wan inkar nekin".

Xwendevanen hêja, divê em vê rastiyê ji baş fêm bikin ku, ji bilî Kurdan, li rûyê erdê tu kes İslamiyete di ser miliyeta xwe re nagire, herkes İslamiyete dike aletê seltenet, miliyet û dewleta xwe. Ji ber vê yekê ye ku Kurdan, bi navê İslamiyete xapandine, dixapînîn û hê ji zirte zirta wan e, dixwazin hê ji bixapînîn.

Gotinên pêşîyan di vê mijarê de, wiha dibêjin: "Vi-re çala xwe dikolin", "Dawiya viran pûc e", "Muslimanî bi viran nabe", "Xwedê bela neheqan ji ber lingê wan bide wan" û hwd.

Em ji bibêjin amîn...

# 'Serdem serdemi neteweke e'

## Mehabat Kurdi

Renge be heleda neçin ger bilen serdemî emrroman serdemî ew netewanen ke wêl ú şeyday azadîn. Rûdaw ú qewmawekanî em yek dû salaney diwayî be aşkira em şiteman bo rûn dekenewe ú debne belgey haşa helnegir lem biwareda.

Her le diway helweşanewey Yeketi Sovyet ú komare benaw sosiyalistekanî Ewrûpay Rojhelat, şepolêki gewrey gorranksariyekan emser ú ewserî dinyayan girtewê ú gelê şit ú diyardey niwê hatne araw. Zor le milletan rabûne ser pê ú kewtine xebat le pênatî mafe rewananî xoyanda. Ítit ewebû be deyan dewleti taze, ke hendekiyan jimarey danıştiwaniyan nagate jimarey danıştiwanî parçeyeki Kurdistanî, dirust bûn ú nawyan kewte naw nawan ú bûne endamî Netewe Yekgirtûkêna xawen ala ú paytext ú supay taybet be xoyan.

Emey Kurdiş, her wek caran, taze ser le niwê, bo carêki dikes, le ciyatî ewey hengawêk binêyin bo pêşewe, hengawêkman na bo diwawê ú bem karesman régay xoman, régay geyin be azadi ú serfiraziman, dirêjîr ú sexttir ú dijwartir kirdewe. Lay hemûşman aşkîrave be fitî kêt ú be elqelegiyî kêt ú kêt em karesate qewma. Gel dilêri Kurd le başûri Kurdistan bê beriye le kar ú kirdewekanî serok merokekanî xoy. Gel hemîse bo amance rasteqînekan le newil ú rîkoşanda biwe ú be sedan hezarî qurbanî dawe. Emî site lay giştman rûn ú aşkîrave.

Emro rojî eweye ke her Kurdeki dilsoz ú niştimanperwer, ewey le destî dê dirêxi lê nekat le pênatî xizmet kirdini wilatekeyda, ke lejîr nîri zulm ú zorî dagir-

keran denalêt. Hetakey koyleti ú bindestî.. Hetakey çewsandinewe ú zordarî.. Hetakey xobestinewe be diruşme boşekan.. Hetakey xohelxetandin ú xotirrandin.. Hetakey dujminanî ú dagirkeranî Kurdistan pêman pê bikenin?

Erki ser şanî hemûman eweye bibîne yek dest ú yek dem ú yek bazû, yek hewir ú tiwana, yek hezi çust ú çalak ú bergegir, şan be şan ú dest tenaw dest bo yek mebest berew lutkey hîwa ú awatekanman, berew azadî ú rîzgarî rége bibîrin. Herçendîş régeman dirêj bêt, ewendeş le serfirazî ú serbexoyî Kurd ú Kurdistan nîzîk debinewe. Eme ezmûni gelanî a-zadixwaze ú debê lîwîyan fêr bîn ú pendyan lê wergirin.

Ba mirove pîs ú mikrobe qirêjekan le nîw xomana nehîlin ú tûrryan heldeyne ser gûfekî gendeli mîjû.. Ba le nîw xomana bab ú bira ú kak bîn... Ba xwêni sûr ú gesî derya asay şehîdanman qet le bîr neçtewê ú toleyan bisenînewe, Kurd witenî: Tole be tole qazancî zore! Ba Kurdistanî azad ú gelêki şad ú serbexo ú serfiraz take birkirdinewey rojaneman bê.

Ger her Kurde rojê carêk em pîrsiyare le xoy bikat, renge biga be hendê encamî besûd: Hetakey jérdeste ú koyle bim? Weramnewey em pîrsiyareş ew kate bedî dê ke Kurd serbest ú azad bê. Ca leber ewe debê kar bikeyn, têkoshîn, bir bikeynewe, yekgirin, régay rasteqîney rîzgarî Kurd ú Kurdistan bigîne ber!

Leserman pêwîst e taqîkirdine-we le rabirdûy bab ú bapîranman wergirin. Nabê rû le rabirdû wergêrîn ú nefret le rûdawekan bikeyn, belku debê waney bekkelk ú dewlemendiyan lê bedes bixeyn. Rabirdû tewawkerî êstage ú êstaş debere tewawkerî diwaroj. Emey

Kurd wek gelêki sitemidicey Rojhelaî Nawerast ú cihan, ger yek negrin ú berengarî dagirkeran ú dujminanî xoman nebinewe, bêguman nawişman le perrey mîjûda reş debêtewê ú tefrutuna debîn. Be kurtî lem dinya ú lew dinyaş, le herdû dînan bê beş debîn. Ca kewate ba he Kurdêk şew

ú roj bir lem mesçeye bikatewe ú be dil ú giyan hewli dilozaneşi bo bidat.

Emro serdemî raperrin şorriş ú netewekean ú bedeshenâni aza-diyekan ú maşî mirovayetiye.. Serdemî dawa kirdini doze lebirkirawekane.. Serdemî hoşiyarbûne-vey gelanî bindestey cihane.. Ser-

demî bextiyarbûn ú rizgarbûn ú xebat ú têkoşane.. Serdemî yek-girtinî rolekani gele zorlêkirawekane.

Ba êmey Kurdiş, wek gewreti-rin gelî çewsawey cihan, xoman bîkeyne qelay azadî ú serbexeyî Kurdistan ú le şemendeferi mîjû-şa diwa nekewin!

## Hêviya dewleta Tirk a dawî jî pûç derket

### Cumali Cotkar

Dewleta Tirk ú Cepha Kurdistanî di meha Cotmehê de hêzên xwe kirin yek ú êris birin ser militan ú gerîlayê Partiya Karkeren Kurdistanê. Di dîroka Kurdan de dê ev meh cihêkî girîng bigire. Ev rastî hîn ji iro ve diyar bûye. Lî dê di pêşeroyê de rola vê mehî hîn zêdetir xuya bike. Dê li ser berxwedana vê mehî gelek dîtin bîn pêşkêşkirin. Ev meh dê wek qonaxek bi serê xwe bê nîrxandîn. Ji ber ku di vê mehî de şerê berxwedanê, têkoşîna azadî ú serxwebûnê gîhîst merhaleyeke nû. Ji ber ku di vê mehî de dewleta dagirker hemû hêzên xwe yêş leşke-ri, aborî ú diplomasî li dîjî hêzên Partiya Karkeren Kurdistanê bi kar anî, lê bi ser neket. Di vê mehî de xiyaneta welatfiroşan pirr vekirî, xwe xuya kir. Di vê mehî de, bi ciðî tasfiyekirina xiyanetî dest pê kir. Meha Cotmehê bû pêşvexistina têkoşîna gelê Kurd. Ji bo van, mirov dikare iro bîbêje ku, meha Cotmehê ya 92 an meheke dîroki ye.

Mirov dikare li ser sedemîn vî şerî, rewşa welêt à pêş ú paş şer û li ser gelek pîrsen din gelek dîtinan bîbêje. Lî li vir ev ne pêwîst e. Gelek welatparêz îl

ser van pîr sekinîn ú nîrxan-dinê pîr hêja kirin. A ku li vir dê bê şîrovekirin, encamên şerî meha Cotmehê ye.

Dî vî şerî de kî qezenc kir? Dewleta Tirk ú Cepha Kurdistanî yan ji Partiya Karkeren Kurdistanê ú gelê Kurd?

Dewleta Tirk ev deh sal in hewl dîde ku şerî azadî ú serxwebûnê "ji bin ve vemiî ne" ú "koka rîber ú militanen vî şerî bikole." Lî dewleta Tirk bi ser neket. Ji bo ku bikaribe bigîhîje armanca xwe, Cepha Kurdistanî bi kar anî. Soza alîkariyê da wan. Jîxwe ew ji, ji bo her xerabiyê amade bûn. Dewleta Tirk, nakokiyêni di navbera Cepha Kurdistanî ú PKK'ê de hîn zêde ú xurttir kir. Dewlet û pêşmergeyan tev bi hev re êris bir ser gerîla. Şer mehekê ú çend roj domand. Gerîla bi her awayî li dîjî van êrisen jîr, jor ú hewa sekinî. Derbeyen mezîn li néyaran û li dosten wan xist. Serokatiya Cepha Kurdistanî, nikaribû gelê Başûr ú pêşmergeyan dîmeke dirêj li dîjî bî-rayen xwe yêş çiyan bi leşkeren Tirk re, bi rî bike. Gel ne li dîjî PKK'ê lê li dîjî serokatiya sex-te sekinî û ev şer protesto kir. Cepha Kurdistanî mecbûr ma ú pêşmerge bi sun ve kişand. Hêzên dewleta Tirk ji nikaribûn


Bi gotinek din mirov dikare bîbêje, bîr ú baweriya şoreşer ú taktikîn rast hem jî alîyê leşkerî û hem ji, ji alîyê siyasi ve bi ser ketiye ú qezenc ne yek ú dido ne, lê gelek in. Hêviya dewleta Tirk, icar Cepha Kurdistanî bû. Lî ev hêvi jî pûç derket. Di 14'ê Mijdarê de, dewleta Tirk bi wezîren İranê ú Sûriyê re rûnişti. Dewlet li dû hêviyên nû ne. Heke ev hêvi jî pûç derkeve, tu astengî li ber gelê Kurd ú hêza wî namîne.

## XAÇEPİRS

**Ceperast:** 1-Niviskar, hunermend, hozan ú folkloristê Kurd. Ji bajare Zaxo ye. Di Welat de, demeke dirêj, li ser folklora Botan rawestiya. Di wêne de tê dîtin 2-Li Kurdistanê çiyayê herî bilind/ Qirêji 2-Xerîb/ Paç, cilik 4-Li İspanyayê, rîxistîne çekdar, ku ji bo rîzgarkirina herêma Baskê têdikoşe/ Graniyek/ Da, dayê 5-Notayek/ Cihê rîwî lê radikevin/ Borrandin, efû 6-Navê meheke buharê 7-Sembola Zêr/ Avek ku li ku keve dişewitîne 8-Xelîca ku di navbera İran ú Iraqê de bû sedemî şer/ Şop, rîç 9-Yan/ Dawî, netice 10-Agir, şewat/ Xelk, gel

**Serejêr:** 1-Mijar, cur/ Kincekî zexm 2-Leheng, mîrxas/Cihêrengî 3-Hîşyari 4-Rêxistînek ku ji bo rîzgarkirina Bakurê İrlândayê têdikoşe/ Dîlî 5-Cihê ku bok-sor lê li hev dixin/ Hêsan 6-Pêkenî /Sembola Kâlsiyûmê 7-Din/ Bi Tirkî kinnivîsına Civata Ewrûpa/ Siftiya nuqtayînê 8-Navê mehek/ Cinavka hebûnê, ku xwedîtiya tiştek dide nîşan 9-Bi Erebi pêşeroj 10-Alfabeya müzikê 11-Heykelîn li dêran 12-Bazirganê debrê

## Amadekar: Rasto Zîlanî



### BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇÜYÎ

**Ceperast:** 1-Casimê Celîl 2-İsa/ Aşîti/ Ag 3-Nûzin/ Mamedo 4-Arengi/ Raser 5-Vin/ Efyon/ Se 6-Dû/ Ark 7-Mela 8-Ra/ Eliko 9-Elamet 10-Belam/ Şe  
**Serejêr:** 1-Cinavk/ Reb 2-Asûri/ Male 3-Sazende/ Al 4-În/ Ülema 5-Mange/ Alem 6-Èş/ İfa/ İt 7-Cim/ YRWK 8-Etarok/ Ode 9-Lîman 10-Ès 11-Lades 12-Gore

## KARTA ABONETİYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ..... pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiyê razînin:

Li Tirkiyê û li derive: Y. Serhat Bucak İş Bankası Cağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin ú tevlî kopyeke pelê razandîna bedelê abonetiyê bişînin.

Navnîşana Welat: Başmusahip Sok. Talas Han 16

Kat:3 No:301 Cağaloğlu /İstanbul

Tel (fax): 512 12 87

Mercen abonetiyê:

Li hundir

6 meh 120.000

12 meh 240.000

Li derive


60 DM

120 DM

# Em bi hev re hîn bibin


4

## EV ÇI YE? NAVÊN VAN BINIVÎSE!




1. Ji texte çêbûye. Çar lingên vî tişti hene. Palika vî tişti jî heye. Mirov li ser rûdînê.

Navê vî tişti ..... e.




2. Ev tişti ji pola û plastik çêbûye. Devikî vî tişti pîr tûj e. Mirov bi destikê vî tişti digire û hinek tiştan pê dibirre. Ên biçük û mezin jî hene.

Navê vî tişti ..... e.




3. Ev tişta difirre. Mirov lê siwar dibin. Tekerê vî tişti jî hene. Hinek bi vî tişti dicin Kurdistanê. Ev tişti pîr zû diçe. Mirov di hundir de xwarinê jî dixwe. Dikare çay û qehwe jî vexwe. Ên biçük û mezin jî hene. Pencereyên vî tişti jî hene. Perrên vî tişti jî hene.

Navê vî tişti ..... e.



4. Ev tişti ji goşt û hestî çêbûye. Mirov lê siwar dibe. Tiştan lê dike û dibe. Ev tişti giya û ka dixwe. Çav, dev, guh, ling û boçika vî tişti heye. Simêن vî tişti jî hene. Hejmara siman çar in.

Navê vî tişti ..... e.



5. Ev tişti dikare bixwe, vexwe, bibîne. Du lingên vî tişti hene û dikare biçe. Nikulê vî tişti heye. Ev tişti, tiştekî pîr baş jî dike. Em vî tişti dixwin. Rengê vî tişti ku em dixwin spî ye û hemâ hemâ girover e.

Navê vî tişti ..... e.

## HINEK TIŞTÊN KU LI KURDISTANÊ HÊŞÎN DİBİN

Te kîjan xwarine? Binê wan xêz bike! genim, ceh, kerşit, nîsk, nok, lazût, kizîn, pembo, birinc, fasûlye, titûn, bacansor, bacanres, îsot bexdenûs, pîvaz, sîr, encûr, xiyar, riwês, pûng, lûz, kereng, sêv, hermî, hinar, tû, remtütik, şikoke, guvîj, gûz, tawî, dîw, pîncar, behîv, incas, gizêr tirî, hêjîr, zebeş, kelek, şemamok, kundir, kuncî, çîlek, gilyaz, xes, kelem, silk, behîvtalik, dirik,

## ZAROKÊN SERHILDANÊ



### Musa Anter


Apo, Musa Anter, di 1918 an de li gundê Zivingê, li Mêrdînê tê cîhanê.

Di 1992.09.20 an de, li Amêmedê (Diyarbekirê) ji hêla dewleta 'Tîrkan' ve tê kuştinî.

Dema Apoyê delal Musa Anter hate kuştinê, ew çend salî bû?

Ew ..... salî bû.

## MÛZ



Hemû mûzên cîhanê ji başûrê rojhilata Asyayê tê. Mirovên ku di giravêن Okyanûsyaya Hindistanê de dijîyan, mûzan bi kelekê (keşfî) biçük ji giravekê dibirin yeke din. Pişt re hinekan bi keştiyekê anîn girava Madagaskarê. Ji vir jî mûz hat başûrê Afrikayê.

Di qîrnê 15 an de, deryavanê Portogalî li rojavayê Afrikayê rastî mûzan hatin. Deryavanê Portogalî jî mûz bi xwe re birin giravên Kanarya û navenda Amerîkayê. Vê gera mûzê çend hezar sal girt. A niha welatên navenda Amerîka mûzan difiroşin gelek dewletên cîhanê. Mûzên ku li Amerîka Bakur, Ewrûpa û li Swêdê têni firotin ji vir têni.

Mûz berê ewqas ne şîrîn bûn. Her ku mûz ji cihekî çû cihekî din, ew şîrîntir bû.

### Di mûzan de vitamîn

Di mûzan de vitamîna A û C jî heye. Li gelek welatên Afrika û Asyayê, mûz xwarineke pîr girîng e. Mirovên li vir her roj mûzan dixwin.

Mirov ji fiberan jî tora masiyan çedîkin. Bi pelan jî tiştan pakêt dîkin.

Kîlekênen pelênen nû, mûzên hîn nebûyî û niçikênen çîçekênen sapên mûzan wek hêşînahî dikelînin û dixwin.

### Mûz li ku hêşîn dibe

Mûz wek mîwe ji cihênen her tim germ û bi baran hez dike. Ji ber vê jî mûz li dorhêlêna Ekvatorê û 30 dereceyî li bakurê û 30 dereceyî jî li başûrê Ekvatorê hêşîn dibe.

Li hêla Amerîka jî bi pirranî li Karîbya, navenda Amerîka û li Başûrê Amerîka hêşîn dibe. Heta Bolîvya û li hemû Brezilyayê jî hêşîn dibe.

Li Afrika jî li dorhêla Ekvatorê hêşîn dibe. Li Bakur heta Sahara û li Başûr jî heta Angola û Tanzanyayê hêşîn dibe.

Mûz li welatên Asyayê, wek Tayland, Maleziya û li Okyanûsyâ; li hêlêna Hindistanê ku pîr baran lê dibare û li Başûrê Awûsturaliyayê hêşîn dibe.

## Welat

Lo welato, welato!  
Tu ji bo me xelato.  
Cihê te ser serê me,  
Her biji tu welato!

Welat welatê me ye,  
Welat hebûna me ye.  
Em qet ji hev cêh nabin,  
Welat li benda me ye.

Welat gelek şîrîn e,  
Bê welat qet jîn nîn e.  
Em te qet ji bîr nakin,  
Bê welat dayîk nîn e.

Di welat de çi tune,  
Welat gula rengîn e.  
Welat zanîngeha me,  
Bê welat dil xemgîn e.

Welatê min, canê min,  
Xaniyê min, mala min.  
Jiyana min tev te ye,  
Namûsa min, ara min.

Çi jin im û çi mîr im,  
Şervan û şoreşger im.  
Bo rîzgarî û azadî,  
Kilaşnikofa zêr im.

Welat namûsa me ye,  
Bin lingên dijmin de ye!  
Ma ha dibe birano!  
Welat li benda me ye.

Ez dibêjim, cano me,  
Gule, bombe gum gum e.  
Rabin, ma hûn ne mîr in?  
Werin şer, ez diçim e.

Partiya Karkerên Kurdistan (PKK), di 27'ê meha Teşrînê (Mijdarê) de kete 15 saliya xwe. Partî 14 salen tije û dagirtî li pey xwe hiştin û îro bûye merkez û hêzeke xurt. Navê PKK nîavekî nas e û ji xuyatirîn navên cîhana serdema me ye. Di van 14 salan de PKK, bûye Partiya milyonan, bûye artêş û cephe, ketiye meclîsê û bi çend zimanî li welat û li derveyî welat hejmarek, kovar û rojname diweşîne.

Di 15 saliya xwe de PKK, nema di salonan de hiltê û êdî li stadyûmê futbolê dicive.

Di nav rojê 20.21 û 22'ê meha Teşrînê de, bi milyonan gelê Kurd ji bo Meclisa neteweyî dengê xwe dan û bi tenê li Ewrûpa, li dora 90 hezar Kurd besdariya hilbijartînê kir. Ev jî ,ji hunerên PKK'ê bû.

Di şerê nav gerîla û pêşmergeyan de me careke din hêza PKK nasî û me dît bê ka xayinê welatê me, dagirkerêne Kurdistanê û împeryalîzm, çendî ji vê hêzê ditirsin û hesaban dikan.

Li ku çi gava pirsa gelê Kurd bibe gotin, Rojhilata Navîn bibe dabaş, hesabê PKK heye û ev hesab xwe sal bi sal ferztir dike.


Ne ev bi tenê.

Qedera gelê Kurd, wêbêya şoreşen welatên Erebî, Tirk û Faris heta bi derecyeke xurt îstikrar, aramî û rewşa demokrasiya herêmê girêdayî jiyanâ nav PKK û serketin û binetina PKK'ê ye.

Ne vala, PKK bûye merkez ji merkezen pêdakezin û mijüliya împeryalist û xwedî nifuzan û dibe hedefa êrîşen militarîst û generalan.

PKK û Serokatiya PKK'ê di Bakurê welat de nema hiltê û diherike dil û mejiyê her Kurdi, ji Urmiye heta bi Silêmaniye, Hewlêr, Qamişlo û Efrînê. Mukurhatin û nirxandina Serleskerê Dewleta Tirk

# MEŞA AZADIYÊ



## DI 15 SALIYA XWE DE

Doğan Güreş jî divê em bi bîr bînin: "Em hinekî din dereng bimana (yanî me û serokên Başûr bi hev re li PKK nexista) niha ne Mesûd û ne jî Celal hebûn. Wê PKK li vir jî bibûya hûtekî heftserî"

Dost û dijminen PKK'ê hene. Di nav dijminan de dagirkerêne Kurdistanê û hevalbendên wanî împeryalist cihê ewil digirin.

Di nav dosten PKK'ê de gelê Kurd ên pêşverû û şoreşgeren herêma Rojhilata Navîn û dinyayê hene.

Belê, dijimin jî û dost jî PKK'ê teqdîr dikin û bi entereseyeke mezin û rojane, vê partiyê dikudînin û nikarin wezna wê talan bikin.

Gelê Kurd wek hêzeke serbixwe, rizgarkir û Mizgîniya rojêni bi rûmet li vê partiyê dinêre. Ji bo xayinê welatê me dagirker û talankerêne Kurdistanê împeryalist û militarîstan, PKK bûye belayek mezin û ketiye Rojhilata Navîn.

Naverok û tecrubeya van her sê herfîn PKK jê re bûye nav rîbaz û xeta Serokayetiya PKK'ê temsil dike, fikirlêkirinê kûr, lêhûrbûnê xurt û xebatê sistemâtikir dixwaze. Tiştê em dê di vê gotarê de li ser bisekinin, ji diyarde û rastiyek mezin û çendalî bi tenê şaxekî biçûk e. Herêma Rojhilata Navîn ji awira partiyen muxalîf û li dijî dewletê bibêje hema bi temamî herêma partiyen demokrat û partiyen komünîst e. Partiyen mayî bi rengekî yan bi rengê din versiyonen partiyekî ji van partian in.

Li Kurdistanê partiyen demokrat û li Tirkîye, İran, Iraq û Sûriyê jî partiyen komünîst, partiyen pirr kevn in. Temenê partiyen demokrat bi deh sal û bîst salan û yên partiyen komünîst jî bîst sal û sîh salan ev çar welatên cîran jî partiyen komünîst in.

Li derveyî van herdu celebêne partiyen muxalîf,

Partiya Karkerêne Kurdistanê tenê jî heye. PKK, partiyek ciwan e, teze dikeve 15 saliya xwe .

Heger mirov ne ji awira emrê mezin û xort, belê ji awira xebat û xizmete, ji awira çareserkirina pirsên siyasi û rîexistinî, organîzêkirin û rakirina gel û ji awira kî ci kiriye PKK'ê bi partiyen demokrat û komünîst re li hember hev bixe, dê bibîne ku ferq û cihêtiyeke mezin heye di nav partian de.

Ev ferq mezin in û li meydanê ne.

Di demekê de ku herdu celebêne partiyen sitewr û bêber bûne, bê insiyatîv û bê prestîj bûne, di demekê de ku partiyen demokrat û komünîst ji armancê demokrasiye û wekheviye dûr ketine û bûne xayinê welat û rîleğirêne pêşketina, Partiya Karkerêne Kurdistanê gav bi gav diqedime, dibe bûldozer, pisûleya û jeneratora şoreşê û dimîne hêza bi tenê di oxi-

ra dewletê de.

Partiyen navê demokrat hildigrin, partiyen bi navê komünîzmê qise dikirin, mane partiyen baskokirî, çengşikestî, şeperze û perîşan. Ev partî destgirêdayî û bêgav mane. Ji qiram ketine, li xwe û li xelkê bûne bar bê perspektif û insiyatîf di wan de nemaye.

Partiyen demokrat û yê komünîst bê siyaset û bê torî ne, rût û tazî mane li rastê. Di giş cepheyan de siyasi, idelojîki, fikri û rîexistinî de bê gotin bûne.

Dijwariyên herêmî, neteweyî û navneteweyî nikarin berhimbêz bikin, pirsa nikarin çareser bikin, gêj in, tewkelî dijîn, bê plan û bê program in.

Ev partî ji partiyen siyasi zêdetir bûne komîk û civatokên emirmend e, li dawiya wext û zemên maîyi, çokşikestî, westiyayî. Bûne darêne hişk û pûç, navkolayî û pişoyî. Edî çi şaxen nû û teze ji wan ne-ma diçin. Ne berê wan maye mirov bixwe û ne ji siya wan maye mirov li ber rûnê.

Van partian partiyekî mirandiye riswa û şermûzar kiriye. Partayetî û endametiya nav partiyekê êdî nemaye cihê serbilindayî û fexrê, belê bûye se-beba xwepirrnîşandinê, xwe biçûkdîtinê û xwetewandar hiskirinê.

Ev partî bûne febrîke û karxaneyen dejenerikerinê, jihevxitinê û bêba-weriya bi gel û komele-yanen xelkê.

Partiya Karkerêne Kurdistan, ne ji van herdu celebêne partiyen siyasi ye. PKK, li ser bingehekî din bi pîvan û şexsiyeteke din ava bûye, partiyek rexnegire, li dijî van herdu partian e. Partiyek xweser, ji bo Kurdistanê radikal û internasyonalist e.

PKK partiyek nû û xwedî pêşeroj e. Ev partî alahilgirê nû, dînamîk û şoreşer e.

**Wê bidome**

- Li ser navê IMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyare Göşti (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyare Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navîşan (Adres): Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 • Tel (Fax) 512 12 87
- Berpirsiyariya Ewrûpa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
- Berpirsiyariya Fransa: Amed Jemo • Rue G-401 92763 Antony Cedex France
- Çapkirin (Baskı): Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım AŞ